

Qeyrana aborî li Tirkîye û Kurdistanê gihîştîye asteke bilind, lewre êdî enflasyon ber bi %100 diçe, kedkarên tirk û gelê kurd her roj xizantir dibin. Bi taybêff li Kurdistanê şer kan û derfetên aborî têk dibe. Dewletê ji bîrî riya berxwedan û îxanetê tu rê li ber gelê kurd nehiştîye. Her çiqas sermayedar li ser rewşa aborî hêstiran bibarîn jî, dîsa lêçûnên şer ji kîsê gel derdikeve. Pêreyên ku bi dek û dolaban jî gel tê standin, dibe faîz û bedela projeyên wekî piştêna ewleht dîsa dikeve berîka sermayedaran. Bo nimûne niha dewleta tirk wê 7 milyonî wekî bedela projeya piştêna ewlehiyê bide sermayedaran.

Rûpel-3

Lêçûna şer ji bêrîka gel dertê

Hewpeyvîn Emin Yalcinkaya re:

Divê jiyana hunermend
û huner li hev bên

Rûpel 8-9

Helim Yusiv:

Li nav xwendekarên
zanîngehan rewşa çandî


Rûpel 4-5

Celalettin Yöyler:

Wêjenasiya
Melayê Cizîrî

Rûpel-13

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Heta stûn neşikê, avahî nakeve

Generalên tirk ji bo ku piştevaniya gel bistînin, xebatê dikin. Ew jî dibînin ku tu rûmeta hikûmet, meclîs û partiyên rejîmê nemaye, lewre sûcê xwe jî dixin stûyê siyaseta vanan.

Dewleta tirk ji alî ve ketiye bin kontrola leşkeran, êdî ew yek ji aliyê hinek derdorên navneteweyî ve jî tê pejirandin. Nûnerên dewletên biyan dema tînan serdana dewleta tirk, pêşî diçin bal leşkeran. Niha li welatên ewrûpî hinek aqilmend artêşa tirk wekî "NGO" ango rêxistinên ne-hikûmetî bi nav dikin. Ji ber vê bîr û baweriya xwe, guh nadin gotinên hikûmetê, çavên wan li ser generalên tirk in.

Dibe ku hinek bibêjin bi rastî jî ewrûpî rola artêşê piçekî mezin dikin, wê gavê serpêhatiya hikûmeta Tansu Çiller û Erbakan tê bîra mirov. Her kes dizane û dipejirîne ku koalîsyona Refah-yolê bi zora leşkeran ji kar dûr ket. Lewre hikûmeta Anasol-d jî tercihê wan bû, CHP jî ji ber vê tercihê piştevaniya hikûmetê dike.

Li aliyekî ev rastî heye, li aliyê din jî gotineke "pêşiyên tirkî" ango generalan heye ku zêdetirî salekê ye ew pir-

bare-dikin. Dîtina ku ji aliyê Çevik Bir ve li Amerîkayê hate bilêvkirin, êdî di her firsendê de ji hêla leşkeran ve tê bilêvkirin. Li gorî xwediyê vê ramanê, "artêşa tirk PKK tîk bîriye, êdî tiştêkî ku leşker bikin nemaye, lewre jî divê siyasî hin gavan biavêjin."

Bi heman mebestê serkaniya giştî ya artêşa tirk, heftiya çûyî dîsa komek roj-nameger birin Kurdistanê. Kesên vewxwendin armanca generalan jî baş didan dest. Lewre ew kes wekî roj-namegerên 'dijber' tînan nasîn û ji bo ku propagandaya vê dîtina navborî bikin, kesên ji wan çêtir bi dest nakevin.

Generalên tirk bi vê kirina xwe ji niha ve du armancên xwe pêk anîne, lewre xwendevanên kesên navborî bi piranî "çepgir û muxalîf" in û bi çavekî pir baş li artêşê nanihêrin, lê piştî ku nivîsên kesên navborî bixwînin, heke nebin evindarên leşkeran jî, wê bi dilovanî li artêşê binêrin. Li aliyê din jî navxwendevanan hinek jî dema nivîskarên

ku gelekî girîngî didan ramanên wan di nav tîmêlên leşkeran de dîtînan, ji ber xwe şerm kirin, êdî hew nivîsên wan dixwînin.

Li vê derê gotineke Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan tê bîra mirov: "Artêşa tirk wekî rêxistineke siyasî xebatê dike." Belê artêşa tirk wekî partiyêke siyasî ku naşibe tu partiyên din, xebatê dike. Generalên tirk ji bo ku piştevaniya gel bistînin, xebatê dikin. Ew jî dibînin ku tu rûmeta hikûmet, meclîs û partiyên rejîmê nemaye, lewre sûcê xwe jî dixin stûyê siyaseta vanan. Bi vê yekê artêşê jî rexne û êrişên gel diparêzin.

Lewre xwendiyên rejîmê dizanin ku hêzên çekdar ên tirk stûna rejîmê ne, her wiha generalên tirk şirikên birjuwazî ne. Lewre OYAK yek ji mezintirîn pawanên Tirkiyeyê ye. Heta artêş xurt be, tu zirar nagihêje sermayedaran û pergala wan.

Serkeftina domdar a PKK'ê

XÊREDÎN DUNDAR

Di van sêsed salên dawî de û heya PKK derket, wekî tînan gelek tevgerên paşverû û pêşverû, an bibin ketin û di kûriya dirokê de hatin çalkirin, an jî, ji cewherê xwe dûr ketin. Hinek ji van tevgerên ku binketin, an jî serketin ev in; Şoreşa Birjuvaziya Fransayê, Sosyalizma Reel, Şoreşa Şiliyê, ya Filistinê, ya tirkî, neteweperestên kevneperest û hwd. Di van tîkçûnan de sedema esasî bîguman serokatî û bîrdozi ye. Yanê, sedema van binketinan ne artêş, ne çek û ne jî aborî ye.

Di sêsed salên dawî de, hinek gel, rêxistin û tevger di nav tîkçûna rizgariya neteweyî de, an jî di şerê çînî de hindik, an jî zêde binketin dîtine û jiyane. Lê bîguman, mîna ku kurd binketin, tu gel, rêxistin an jî tevger bi bin ketine. Ji ber ku, gelê kurd di dirokê de tenê ne di şer de bibin ketibû. Li hêla madî, manewî, giyan, şewq, moral û hwd. de jî bi bin ketibû. Lewre ne çand, ne ziman, ne serokatîyeke hemdemî, ne cewher, ne dirok ne jî giyana berxwedanê, tiştêkî nemabû ku xwe pê bigire û bijî. Ji ber vê yekê binketina kurdan ne binketîneke wisa xwezayî ye. Mêtîngerên ku li her çar aliyên welêt ala xwe dihejandin, ji bo ku gelê kurd xwe bide bin siya wê, bi hey û din re diketin pêşbaziyê.

Belê, ew diroka ku ser nişov diçû, heya ku mirovê mezin ji diroka mirovahiyê re rûpeleke nûjen vekir û diroka binketîne zivirand, serkeftîne dido-

miya. Lê piştî ku mirovê mezin ev gava mûcîzewî avêt, guhartîneke xwezahî çêbû û ew ewrên reş û tarî, roj bi roj ji ser welat belav bûn. Lewra PKK di destpêkê de li dijî binketîna û tunebûnê bi hêzeke alternatîf derket ser dika dirokê. Mirovê Mezin gavavêtîneke xwe yê mûcîzewî domdar kir. Lewre, ewî baş dizanibû ku, sekinandin, mirina konevanî û tunebûna gelekî di gel xwe tîne. Ji ber vê yekê, Mirovê Mezin dibêje: "Hawê min, yê bilindbûnê hawekî helezonvarî ye." Yanî di bi-

PKK'ê mîna tevgerên din, ji ramyarî ya reformîzmê dîrxistî û bi rengêkî dijwar şerê ku li dijî dijminê hundir û derve dayiye. Yanî şerê çînî ye.

Belê, di roja îroyîn de tiştê ku PKK'ê bê binketîna dike, serkeftina sosyalîzma zanyarî ya ku di nav PKK'ê de hatiye karkirin e. Ji ber ku PKK, navê livbaziya afirandina cîhanê azad e. Wê demê tîkçûna PKK'ê dibe malê hemû mirovahiya cîhanê. Heger, tevgerêkî ji tevahiya mirovahiyê re bibe mal û hêvî, wê gavê ketin û binketina wê jî ne gengaz e. Bi kurtî sedemên ku PKK anîn û qonaxê tenê ne ev in: Bi cewherî rûmeta ku PKK dide kedê, girêdana wê ya bi şehîdan, azadbûna jinê re û tîkîlî û hezkirina di nav tîkçûnê de û hwd e. Ev jî dide xuyakirin ku eşq û evîna Mem û Zînê ya mayî, di roja îroyîn de PKK bi rengêkî zanyarî pêk tîne.

Di roja îroyîn de, di nav qadên navneteweyî de jî PKK tenê bi serê xwe kela komûnîzmê ye. Lewra PKK li Mezopotamyayê li dera ku mirovahî lê zayîye de, gelekî mirî dîsa vejand û bû mîlada nû. Ev jî, vê di-xuyakirin ku bîngeha tevgera tîkçûna azadiyê çiqas qewîn e û ne gengaz e ku tu car bi bin bikeve. Ji ber vê yekê, di van sêsed salên dawî de tenê PKK bi bin ketîye. Di vê encamê de ev tînan gotin: "PKK'ya ku bi bin nakeve, serokatîya ku nayê tîkçûnê e. Ev jî, bin ketina dijmin, serkeftina serxwebûn û azadiya Rojhilata Navîn e. Dîsa serkeftina tîkçûna azadiyê, tunebûn û mirina xiyamet û kevneperestiyê e.

Ferhengok

aborîzan: ekonomîst
ango: wate veyaxût
ast: derax, seviye, rade
avahî: mal, bîna
berdar: bi adan(verimî)
cest: laş
çilwîlîn: bilbîsîn,
biriqandin
demsal: werz, dansal
deshilatdar: serdest,
hakîm
faşbûn: harbûn, mizir
giyan: ruh, can
gotar: maqale
gundên tomerî: toplu
köyler
handan: teşwîqkirin
helsengandin: nixxandin
hest: hîs, duygu
hewîn: sebr
hêzên bejî: kara
kuvvedan
hişmendî: şûr
kevnare: antîk, ilkel
kelk: havîl, sîd
kutakirin: qedandin,
xilaskirin
lasayîkirin: zarvekirin,
bîlan kirin
lawir: sewal, ajal
lêçûn: mesref
mental: kalkan
meyt: cendek, term
mezeloq: şîrêz
mêjû: dirok, tarîx

nakokî: tenakuz
nix: hêjahî
nîjadperestî: irqperestî
perwerde: hêvotin,
pêşbirk: pêşbazî (yanî)
pişkiyîn: ajdan filizlen-
me
piştên: kember
qerzdar: deyndar
qeyran: krîz, tengasî
qir: asfalt
qop: kulek, leng
rabirdû: rabûrî, mazî
ramangirî: rasyonelîzm
ramyarî: konevanî,
siyasî
rave: izah
raydan: nişandan
rêje: oran, derece
rasteqînî: rastbînî, real
sako: çeket, kurdik
sazkar: avakar
damezrîner
sedem: eger, sebeb
sosîmet: qeşmer,
şanoger: teatrvan
şarîstan: medeniyet
tîkçûn: pelîşîn
tomik: kesp û kond
tund: bi şiddet, tûj
wêjenas: edebiyatnas
xemgîn: dilêş, dilkeser
xwezî: siruşt, tebiat
xewneresk: kabûs
zanîngêh: universîte

Tîkçûna PKK'ê dibe malê hemû mirovahiya cîhanê. Heger, tevgerêkî ji tevahiya mirovahiyê re bibe mal û hêvî, wê gavê ketin û binketina wê ne gengaz e.

lindbûna serokatîyê de qet sekinandin û nizimbûn tune ye.

Bîguman, sedemên ku tevgera PKK'ê nabin binketîneke pir in. Lê an-cax, hinek jî van sedeman hene, ku PKK'ê tim bilind û bi ser dixînin. Çi ne ev sedem? Mîna ku me li jor jî anî ziman sedema yekem serokatîya PKK'ê û diyalektîka PKK'ê ye. PKK jî bo ku welatekî azad û sosyalîst bide avakirin, pêşiyê mirovê sosyalîst û kesayetiyên ku bi bin ketine vegerînin serkeftîne afirandî. Dî vê xalê de, diroka cîhanê û rewşa mirovahiyê bi rengêkî zanyarî, bi wan mirovan lêkolîn kirin û çareseriyên li gorî demê afirandin. Dîsa sedemeke din jî ye ku

Lêçûna şer ji berîka gel dertê

Generalên tirk piştî her operasyonê diyar dikin ku hikûmet pere nade wan, li hemberî van yekan aborîzan diyar dikin ku aboriya şer ji berîka gel dertê. Li gorî heman kesan êdî rayedarên dewletê lêçûnên şer bi zem û bi riya porsa ji bo perwerdehiya 8 salan û qumarên neteweyî peyda dike.



Dewleta tirk ji bo pêkanîna herêma tampon li ser sînorê başûr û bakurê Kurdistanê ketiye nava keftûlesteke mezin. Li gorî agahiyan li ser sînor ji bo vê mebestê qereqol û quleyên çavdêriyê tî avakirin. Piştî ewlehiyê ango herêma tampon ji gundê fileyan ku bi darê zorê hatiye valakirin dest pê dike, hetâ sînorê Îranê diçe. Ev gund bi 23 km'î dikeve rojavayê Zaxoyê, xebatê ve yekê ji aliyê gelê Zaxoyê ve tê dîtin. Her wiha tê daxuyandin ku hêzên tirk tevî hêzên Barzanî bi vê armancê gelek gund vala kirine, gundî şandine gundên tomerî. Rayedarên tirk soz dane gundiyan ku av û elektrîkê binin gund. Li van gundan wê quleyên çavdêriyê hebin û tê de tirk û PDK'î wê bi hev re bixebitin. Her wiha rayedarên tirk dixwazin gundiyan bikin cerdevan û meaşê cerdevanan bidin wan.

Her çiqas rayedarên tirk vê planê digerin jî, gelek welat û rêxistin li dijî ve yekê derdikevin. Bi taybetî welatên ereb, didin zanîn ku ewê tiştekî wisa tu car nepejirnin. Her wiha YNK û hêzên Yekîtiya Neteweyî jî dijberiya xwe li dijî ve planê diyar dikin. Emerîka û welatên ewrûpî dengê xwe dernaxin, lewre tê gotin ku dewleta tirk li Başûr planên Emerîkayê digerin. Li gorî kesên ku ve yekê dibêjin, piştî ku hêzên Sedam bi vexwendina PDK'ê ketine Hewlêrê Emerîkayê hêzên xwe yên bejî ji Başûr kişandine, lewre niha valahiyek pêk hatîye, ji ber ku Emerîka naxwaze valahî ji hêla hêzên welatparêz ên Kurdistanê ve bê dagirtin, piştevaniya dewleta tirk dike. Lê li welatên ewrûpî jî kesên ku li dijî kirinên dewleta tirk derdikevin gelek in. Bo nimûne roja 17'ê sermawezê li parlamentoya Îngilistanê panelê li dar ket. Di vê panelê de parlamenterên Îngilîz bang li welatên ewrûpî û Emerîkayê kirin da ku ji Tirkiyeyê vekîşandina hêzên xwe ji Başûrê Kurdistanê bixwazin. Tiştekî balkêş jî di vê panelê

de ev e ku kesên navborî ji dewleta tirk xwestîne ku hem li Bakur û hem jî li Başûr rûmetê bide mafên mirovan. Parlamenterên wekî, John Austin Walker, Jeremy Cornby, Lord Avebury biryar dane ku di nava parlamentoyê de bi navê "Dostên Kurdan" komekê ava bikin.

Tê gotin ku Lord Avebury helwesteke tûj li dijî êrişên dewleta tirk û herêma tampon nîşan daye û daye zanîn ku tiştên bi vî rengî cesaretê didin êrişkarên din jî. Nûnerê YNK'ê yê Londonê Dr. Latîf Raşîd jî diyar kiriye ku Tirkiyeyê li Başûr rêveberiyekê bi rêkûpêk naxwaze, lewre jî ji bo ku rê li ber pêkhatina rêveberiyê herêmî bê girtin, çî jê tê dike.

Dewleta tirk berê jî xwestibû li wir herêmeke tampon pêk bîne, lê ji ber maliyeta wê, reaksiyonên navneteweyî û êrişên gerîla ev plan bi ser neketibû.

Birjuwaziyê hikûmet dîl girtiye

Tê gotin ku, ev plana Ecevit dê bi alîkariya hin şirketên wekî DOĞUŞ holding û ENKA'yê bimeşe û dê nêzikî 7 katrilyonî li vê projeyê biçê.

Li aliyekî generalên tirk piştî her operasyonê diyar dikin ku hikûmet pere nade wan, li hemberî van yekan aborîzan diyar dikin ku aboriya şer ji berîka gel dertê. Li gorî heman kesan êdî rayedarên dewletê lêçûnên şer bi zem û bi riya porsa ji bo perwerdehiya 8 salan û 'qumarên neteweyî' peyda dikin. Tê dîtin ku di navbera artêşê û hêzên sermayedar de jî tîkiliyê balkêş heye. Wekî mînak, nameyê ku Vehbi Koç piştî darbeya 12'yê rezberê ji Kenan Evren re şandiye ve yekê baş çêkare dike. Di vê nameya Vehbi Koç perspektîfê dide leşkeran û leşker jî wê pêk tînin.

Di vê nameya navborî de Koç li ser pirsgrêkên etnîk û metirsiya komunîzmê disekine, di nameya xwe de wiha dibêje: "Tevgerên komunîst, kurd, ermenî û hwd. helbet wê her tim li hemberî dew-

letê tîbikoşin, divê li hemberî wan ji bo rojên pêş tevdir bînin hildan." Tîkiliya sermayedarên bi ve yekê jî bi sînor nînin, aborîzan Arslan Başer Kafaoglu li ser sermayedarên Tirkiyeyê agahiyên balkêş dane rojnameya me.

Li gorî Arslan Başer Kafaoglu sermaye wekî çawa ku pisîk bi mişk dilîze bi hikûmetê dilîze û artêş jî alîkarê wê ye. Kafaoglu li ser ve yekê mîna keke wiha dide; 'piştî her operasyonê artêş diyar dike ku hikûmet pereyan nade wan. Kafaoglu ve yekê bi awayekî din jî şîrove dike: "217 saziyên karsaz 86 katrilyon bacê (vergi) didin, faîza ku ji dewletê distînin jî 255 katrilyon e. Dema ku sermayedar dixwazin hikûmetê bixin tengasiyê û artêş jî alîkariya wan dike." A. Başer Kafaoglu dide zanîn ku pirsgrêka Tirkiyeyê ya herî mezin sistema dewletê ye ku di warê aborî de dikeve defika sermayeyê, ev jî nahêle ku hikûmet bi hêz bibin û pirsgrêkan çareser bikin.

Li ser ve jî mîna keke wiha dide, di sala 1992'an de deynê dewletê ji sermayê re 400 trilyon bû, îro 17 katrilyon e. Hetta wê demê faîlî meçhûl nînin in, qetlîamên artêşê û provokasyonên polîsan nînin in, piştî wê demê ji nişka ve digihêjin asta herî bilind. Dîsa Kafaoglu diyar dike ku pirsgrêka herî mezin ev e ku sermayedarên hikûmet dîl girtiye, sermaye naxwaze şer biqede, ji ber ve yekê jî pêşketin çênabe. Kafaoglu ve jî wiha şîrove dike: "Dahatîya Tirkiyeyê 200 milyar dolar e, pereyê ku li şer diçe 7 milyar dolar e, ev pere ewqas pereyekî mezin nînin e ji bo Tirkiyeyê. Lê piştî her operasyonê zam çêdibe, ev jî nîşan dide ku lêçûna şer ji berîka gel dertê." Li gorî Kafaoglu şirketên wekî ENKA, DOĞUŞ, ALARKO jî heke li Başûr alîkariya leşkeran kiribin an jî dikin ev ji bo wan tê wateya hin berjewendiyên din.

NAVENDA NÜÇEYAN

Kurtenbûce

Kuştin û şewitandin

Endamê çeteya Gewerê îtirafkar Kahraman Bilgiç îtiraf kir ku, 3 gundiyan bi navê Şemsetîn Yurtseven, Mihdat Özekan, Münir Sartaş û Abdullah Canan bi talimatên Binbaşî M. Emin Yurdakul hatine kuştin. Roja 17'ê sermawezê Kahraman Bilgiç, di mehkemê de wiha got: "Di bihara 1994'an de piştî operasyonê ji gundê Ağaçlı'yê me 3 gundî girtin binçav. Ji 3 gundiyan yê kal ji ber lêdana M. Emin Yurdakul mir. Pişt re Yurdakul fermana kuştinê da, gundiyeke ji hêla Yuzbaşî Nihat Yigiter yê din jî ji hêla Üsteğmen Bülent Yetüd ve bi çekên G-3'yan hatin kuştin."

The Economist:

"Tirkiye bomba napalmê bikartîne" Partiya Demokrat a Kurdistan PDK, ku li Başûrê Kurdistanê bi hêzên leşkerî ên tirk re tevdigere, ji gerîlayên ARGK'ê derbeyên giran dixwe. Bi taybetî şer; li herêmên Hiran, Hesên Beg, Xanika, Herîr û navçeya Sîdekan bi awayekî tund didome. Piştî ku hat ragihandin, ku dewleta tirk bi taybetî li Sîdekan bi giştî jî li herêmê bombeyên mîsket û napalmê bikartîne, çapemeniya navneteweyî jî bala xwe da ser ve rûdanê. Rojnameya "The Economist" di nûçeyên xwe de çî tevî daxuyaniyên YNK'ê, çîh da bikaranîna bombeyên Napalmê li herêmê.

Salvegera PKK'ê

Roja 17'ê sermawezê di der barê salvegera damezirandina Partiya Karkerên Kurdistan PKK'ê de, li Zanîngeha Dicleyê ji hêla xwendekaran ve slogan hatin nivîsin. Bi taybetî li "Eğitim Fakültesi" li beşa "Fen bilimleri" li ser dîwaran sloganên wekî "Bijî PKK", "Bijî ARGK", "Bijî 27'ê Sermawezê", "Bijî Têkoşîna Rizgariya Neteweya Kurdistanê" û "Bijî internasyonalîzm" hatin nivîsin, alên kahez yê ERNK û PKK'ê jî hatin zeliqandin. Piştî ve bûyerê derdora Zanîngehê ji hêla polîsan ve hate dorpeçkirin û slogan bi boyaxên rûnî hatin veşartin. Heyeta Karadeniz'ê birêket.

Heyeta Karadenizê

Heyeta Karadeniz'ê, ku der barê sistema cerdevaniyê, valakirina gundan, faaliyetên kontrayî û înfazên bêdaraz de wê li herêmê lîkolîn û hevdiştin bike, roja 19'ê sermawezê bi rêket û çû Tokat'ê. Di heyeta ku wê li bajarên wekî Samsun, Ordu û Giresun ê jî bigere de, ji sazî, komele û partiyan kesên wekî Emel Sungur (Sekretera Giştî ya PSAD), Endamê MYK'ya HADEP'ê İsmail Arslan, Nevzat Eski (DBP), Olgun Delikanlı (ÖDP), Metin Taşınar (BP), Recep Adıgüzel (SİP), Veysel Gencil (KESK-GYK), Meral Bekar (İHD), Sabutay Alptürk (TMMOB) û İbrahim Karakaya (Tuncelililer Derneği) çîh digirin.

Di nav xwendekarên zanîngehên Başûrê Biçûk de rewşa çandî

Dema em vê rewşa xwe bidin hemberî kirin û avahiyên ku milletên li derdorê û li dinyayê pêk fînin, rastî xwe dide pêş. Ne tiştekî mezin e eger rewşa zimanê me ji berî pêncî salî çêtir be. Ji ber ku di pêvajokê de dem berpirsariya gelan mezintir dike.

HELÎM YÛSIV

Li du zanîngehên sûrî, zanîngehên "Helebê û Lazîqiyê" me pirsên xwe gihandin destên sed xwendekarên kurd. Pêncî keç û pêncî xort. Hetanî me karîbû me ev keç û xort ji kesên ne li derdora xwe hilbijartin û me xwest di dîtî û nêrînên xwe de cur bi cur bin. Di vê gavê de daxwaze me ew bû ku em hinekî nêzikî rastiya rewşa zimanê kurdî bibin. Me xwendekarên zanîngehan hilbijartin. Ji ber ku di civakê de, hema tu dikarî bibêjî ku hejmara xwendekarên zimanê kurdî ji sedî ne yek e jî. Ji ber vê ev hejmarên em binivîsin di nav civakê de bi gelekî ji wilo kêmtir e. Lê di daxwaz û perwerdehiya zarok, xort û keçên xwe de jî, jin û mêrên têgihîştî li çûn û hatinê doza xwendinê dikin "rabin bixwînin-rûnin bixwînin". Gelo xwendina di dibistan, instîtû û zanîngehan de bes e? Yan ev xwendin tenê bingeh e ji bo avakirina mirovekî têgihîştî? Di encamê de civak bi tevayî û gelek ji xwendekarên me kutakirina xwendinê ji wan re dibe armanc. Hetanî çi pêpelûkê ev dîtî rast e? Hetanî vê gavê tevlihevî heye di navbera xwendekarên ku xwendina bilind kuta kirine û rewşenbîran de. Pêwîst e ew di wê baweriyê de bin ku xwendina bilind nikare mirov bike xwediyê agahiyên bilind; nikare bike mirovekî têgihîştî. Vê yekê hişt ku em hinekî pirsên xwe (ziman, civak, zanîn, çare) pir bikin. Pirsên me çar bûn, ew jî ev bûn:

1- Tu bi zimanê xwe dixwîni û dinivîsinî yan na? Çima?

2-Têkiliyên te bi xortan/keçan re hene yan na? Çima?

3-Ji pêvî pirtûkên zanîngehê tu tiştekî din dixwîni yan na? Çima?

Heke bersiv "Erê-be", çi ne? Heke "Na be", çima?

4-Di nêrîna te de, çi çare ji van pirs-girêkan re hene?

Xwendekar nikarin bi kurdî bixwînin

Li ser ziman bersivên wan ji sedî heştê (% 80) nizanin bi zimanê xwe binivîsin û çarde kesên din ji wan li gorî wan dizanin bixwînin, lê nizanin bi-



Ji nav xwendekarên zanîngehên başûrê biçûk bi sedan gerîla derketine, îê ji sedî bîstê wan dikarin bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin.

nivîsin. Di encamê de bist xwendekar ji sedî, bi zimanê xwe dizanin bixwînin û binivîsin. Ev bîstê ku zanin ji hinek ji wan di nivîsandina xwe de şaş diçûn. Wekî mînak "erê" wilo dinivîsandin "arê". Zanebûna hinekan ji wan naskirina tîpan tenê ye. Hejmareke gelekî hindik bersivên wan bê şaşîti hatibûn nivîsandin. Belê eger di nav xwendekarên xwendina bilind (zanîngeh) de rewşa zimanê kurdî bi vî awayî be? Ka rewşa vî zimanî wê di civakê de çawa be? Mirov dibû ku ji vê rêjeya % 20 razî bûya jî, eger ev hejmar serast bûya û li gorî wê rojname, kovar, pirtûkên bi kurdî bihatana xwendin. Ji ber ku bersiva ku xwediyên pirtûkxaneyên li herêmên kurdan didin, dide xuyakirin ku xwendevanên zimanê kurdî ancax bi dûrbînan bîn dîtî. Di vê pêvajokê de gelek pirs xwe davêjin holê. Tevgera siyasî ya kurdî li Başûrê Biçûk ji berî çil salî de dest bi kar kiriye û temenê rêxistinên neteweyî çil sal derbas kirine. Eger ji karê çekdarî xwe şûstibûn jî,

lê belê ji hêla çandê û ziman ve di encamê de ka çi hatiye kirin? Nemaze ev çend kesên ku bi kurdî mijûl dibin û dinivîsinin piraniya wan bêyî alîkariya tu rêxistinan bi xwe hîn bûne û eger belavokeke rêxistinekê bi zimanê kurdî derkeve ez di wê baweriyê de me ku gelek ji endamên wê rêxistina neteweyî nizanin, bixwînin. Gelo ev encam û aqil çi ji hev re dibêjin? Çawa em wan deynin hemberî hev. Ez bawer nakim ku mînakek bi vî rengî kambax ji bilî kurdan di dîroka tu milletî de li cihanê peyda bibe. Niha emê hinek nimûneyên balkêş ji bersivên xwendekarên ku nizanin bi zimanê xwe bixwînin, bînin ber çavan:

-Kesek tune ye me fêr bike. Kesî ez fêr nekirime.

-Ez di ser guhê xwe re diavêjim.

-Ez vala nabim.

-Kitêb tune.

-Divê ez hîn bibim, mamoste ji min re divê, ew jî tune ye.

Ji bo çareserkirina pirs-girêka dûrke-

tina ji zimanê dê jî, ji sedî pêncî û pênc vekirina dewre û qursên zimanê kurdî didîtî. Ew riya çareserkirinê ye di wê demê de. Lê tu kes ji bi vî karî ranebe. Hinekan jî digot:

-Ez nizanim.

-Divê yê zane yê nezan hîn bike.

-Divê her yek bi xwe xwe hîn bibe.

-Divê semîner û komcivîn ji bo ziman saz bibin.

Rawşa parçeyên din jî ne baştir e

Li gor rojevê jî, her karê dewre û komcivînen fêrkirina zimên her ku li dar dikevin, berî ku herin serî ber diavêjin. Tu mînakên bi serketî di vî warî de me nedîtine. Li gorî rewşê pêwîst e ku xort û keç li benda tu kesî nemîne û li zimanê xwe xwedî derkeve. Me mînakên Başûrê Biçûk hinekî şîrove kirin. Lê tê xuyakirin ku li her devera welêt û li derveyî welat jî li bajarên tirk, ereb û farisan jî rewşa zimanê kurdî di nav kurdan de rewşeke xerab û seyr e.

Mînaka din jî ya ku me bi xwe ji nêzikayî dît, be-ri demekê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) bû. Bi rastî dilê mirov diêşiya dema mirovekî wekî min mêvan derbas bibe hundir sazgeheke kurdî hêja wekî NÇM'ê û peyveke bi kurdî li ber guhê wî ne-keve. Ku piraniya xebatkarên vê sazgeha hêja bi hev re ne bi kurdî diaxivin û piraniya programan ne bi kurdî, lê bi zimanekî din tîn amadekirin. Vêca normal e ku yek xemgîniya xwe li ser vê rewşê diyar bike ku di eynî demê de bi sedan xort û keçên me, mirovên me xwîn û jiyân û giyanên xwe dikin qurban ji bo bi serketina ziman û doza kurdan.

Kêfa xwendekaran ji xwendinê re nayê

Pirsa me ya duyemîn li ser tîkiliyên keç û xortên kurd bû ji hêla civakî de. Bi tevayiya xortan pêwîstiya tîkiliyê berçav dikirin ji bilî sisiyan. Ji pîncî, sê xort bê tîkilî bûn, sedemên wan jî ev bûn:

- Keç tev de nebaş in û netîştêk in.
- Hema rihê min ji wan diçe. Her roj bi awayekî ne.
- Keç nezanim, keç tunene, ne ji mecbûrî be ez nakevim tu tîkiliyan.

Di bersivên keçan de jî digotin erê ji tîkiliyê re lê... Ev her du tîp (lê) di hemû bersivan de peyda dibû... Lê divê sînora hebin. Keç bi tevayî li sînoran xwedî derdiketin, ji bilî şaş keçên ji pîncî ku ne bi tîkiliyan re bûn.

Sedemên wan şeşan jî ev bûn:

- Xortên me wek pîrekên li ser tenûran in û nexweş in!
- Ji ber ku xort nezan û negihîştî ne.
- Wîlo ez guh nadim xortan mortan.
- Ev tişt ne gerek e. Tîkilî hebe jî divê bi sînora be, yan jî ji bo zewacê be.



Li Bakur di warê siyasî de gavên mezin hatine avêtin, êdî zarokên kurd jî bi doza neteweyî hesiyane, lê mixabin di warê çand û zimanê kurdî de hê jî sersariyek balê dikişîne.

- Ji ber ku hevaltî nîn e, hevaltîya xortan wekî hevaltîya bi afyonê re ye.

- Ez nizanim.

Pirsa sêyemîn li ser xwendinê bû. Kêm kes hebûn bersiva wan "na" bû. Sedemên wan jî wisa bû:

- Serê min ji xwendinê diêşe
- Kêfa min ji xwendinê re nayê


- Dem tune ye ji bo xwendinê... û di nav ên ku gotine "erê" jî, hinek ji wan pirtûkek û dido yan jî çend kovar û rojname xwendine û tiştên ku tîn xwendin ev in: Dîrok, tore çand, siyasî û pişt re felsefe û tiştên din.

Di encamê de tê xuyakirin ku dîrketina ji xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bûye yek ji nasnamiyên civata kurdan û tu carî ev dîtinên ku dibêjin "Rewş çêtir e ji berê", dilê mirov xweş nakin.

Dema em vê rewşa xwe bidin hemberî kirin û avahiyên ku miletên li derdorê û li dinyayê pêk tînin, rastî xwe dide pêş. Ne tiştêkî mezin e eger rewşa zimanê me ji berî pîncî salî çêtir be. Ji ber ku di pêvajokê de dem berpirsariya gelan mezintir dike. Jixwe gelê ku li stûnên hebûna xwe xwedî dernekeve tu carî, jiyane bi dest naxe û bi hêsanî tê binerd kirin.

Ambargo (I)

MEDENÎ FERHO



"Mirovê ku xwe li hemberî herika dîrokê pêşbirk û bend bibîne, wê di kevçiyek av de bixeniqe" (Hiseynê Ferho)

Dema pêwîstî çênabe, mirov pêdiviya ramîne nabîne. Pêwîstî û pêdivî dermanê pîrs û pîrgirêkan e. Lê dem, cilika pêçana birînan e. Heger mirov xwe li hemberî cîhana dijwar û dijmin nedîtibûya nedibû "homo faber" û "homo moralîs". Her wiha raman di rojekê de pêk nayê û nakeve nava hest û cêstên jîndariyê. "Homo faber" pir bi pêş ket. Mirovaniya ku xweza kire bindestên xwe, mirovaniya xwe wîndî kir. (Mîna helbestvanekî ku mirovan ji bîr bike û li ser pisîkan binivîse.)

Li gor Eflatûn, felsefe ji seyr û kesnediya şelişibûnê pişkiviye û berz bûye. Seyra kesnediya şelişibûnê, hêj nebûye tov û tîhnikdana veketîniya ya mêjiyê kurdî. Tun û

benditiya "Qureyşî" ya putperestî di nava hûnandina laşê hinek mirovên kurd de bûye tovê jiyane. Yan jî, vî nîfşî para xwe ji şaristaniya hemdemî nestandîye, berê xwe daye xirîqa Tîmurlengê kerdiz û "kîna berazî" ya îttîhatiyan. Li hemberî destûrên cîhanê ku yek jê nêrîna mîkroskobîk e, ya din jî nêrîna makroskobîk e, bêwate mane û destûra mîkroskobîk ji xwe re neqandine. Lewre çiqas hewl bidin û keferate bikin jî nagihîne hevalên xwe. (Mîna sedarekî ku di destekî wî de daqoq hebe, di destê din de pênûs hebe, lê ew her dem daqoq bi kar bîne)

Newekheviya pirtûkan û nivîskar, her dem tomikên mezin derdixe hemberî mirovaniyê. Nexasim ku ev nivîskar sedarekî ku doza desthilatîyê dike be. Ji ber ku mirovaniyê pîrgirêkên xwe bi ramangirî çareser kirine. Ne ku bi despotîzma serdar û rêzanê hişê xwe xwarî. Sedemeke ku nemyê be dema derkeve holê. Gelo agir di kîjan tîfikê de pêketiye û kîjan paşazade fermana despotîzm û fanatîzmê dide? (Mîna mirovekî nivîskar ku serdar be û kompleksên xwe derbixe hemberî ramangirî, yan jî di bandora hişmendiyê kevnar, pûş û kûfîkî de bimîne.)

Şaristaniya kevnar, mîna çînen kevnar di

wê baweriyê de ye ku bi hêrvandin û tîkçûna wan re cîhan jî xeremal dibe. Ev dilxweşiyek tîr tomik û tîrsnakî ye. (Mîna rêzanekî ku pusula xwe wîndî kiribe û hêviya wî mabe gur û lawirên dirinde)

Li gorî Thierry, mirov li hemberî mirovan şer bike bi pêş nakeve. Li hemberî xwezayê şer kirin, pêşketinê tîne; ku dîrok bi şerê li hemberî xwezayê berz dibe. Zanistiya xweza û zanistiya civaka ji hev cuda dibe û politîka tê pê. Bîrdoza îdeal, tez û antî-teza di navbera mirov û xwezayê de ye. (Yanî teze serdarekî mêjî westiyayî, ku bi awireke pesîmîst (şikestî-restarî) li cîhanê dinêre û daxwaza desthilatîya komên xelkê bike.)

Ambargo: Îdeolojiya dawîya sedsala 20'an e. Ku çewtî, xaponekiye nekarîni û çelsiya mêjî ye. Mirovên bi xwe û hêza xwe ne ewle vê îdeolojiyê ji xwe re dikine mertal. Dîrok, ava li herikê ye ku tu bend û bîrk û mertalan li pêşberî xwe napejirîne. Di dawîya sedsala 20'an de ambargo=kûzêna perîşaniyêke tîr keçelî ye.

Gotina dawî: Rewşenbîr dema dişewite ronahiyê dide û dema dibe şêr dişewite. Lê agirê ku bi dewlek-şitîlek av bête tefandin wêranî ye.

Payiz demsaleke xemgîn e

Payiz demsaleke xemgîniyê ye, hevaleyê min a pir hêja li başûrê Kurdistanê şehîd ket... Ji bo min ew mirineke herî mezin bû. Şehîdên me ji bo me hemîn gernas û welatparez in, hêyv in... ronahî ne, stêrk in li ezmana dibiriqin... Hûn zanin hevala min a hêja navê wê Gurbettelî bû...

ROZERÎN KAYA

Ew dema payizê sar û dûr e ji mirovan. Ez ji bo wê yekê tu caran ji demsala payizê hez nakim. Payizê darên hêşîn pelgên xwe diweşînin û pelg zer dibin, ji daran dikevin erdê dimirin. Gelek tişt jî hevûdu vediqetin... Ew payiza di ser me de hat ji bo me ne baş bû, cara ewil zilamê min nexweş ket, dilê wî diêşiya, wê li welatê xeribiyê emeliyat bibûya, ez ji wî gelekî dûr bûm, kesekî dost û hêja ji tunebû ku xeberekê ji wî bide min, an gazî min bike, ez herim cem li nexweşxaneyê alikariya wî bikim. Ji bo wê ez mirovên derdora xwe jî pir ne hêvîdar im û xemgîn im... ji bo pêşerojê difikirim. Payiz demsaleke xemgîniyê ye. Sedema duyemîn hevaleyê min a pir hêja li başûrê Kurdistanê şehîd ket... Ji bo min ew jî mirineke herî mezin bû, ez pir bi ber xwe ketim.

Şehîdên me ji bo me hemî gernas û welatparez in, hêyv in... ronahî ne, stêrk in li ezmana dibiriqin... Hûn zanin hevala min a hêja navê wê Gurbettelî bû... Li wê derê gerînendeya rojnameya Özgür Gündemê bû. Di van salên çûyî de me tev bi hev re gelek rojên dirokî derbas

kirin. Ew roj ji bîra min naçin, her tim di xewn û xeyalên min de ne. Ez car caran difikirim; ew rojên Özgür Gündemê yê dirokî yek û yek tîn ber çavên min.

Piştî derketina zilamê min, ez tim diçûm Özgür Gündemê, sibeyekê saet di nehan de min ji bayiya herî nêzikî rojnameya Özgür Gündemê pirs kir. Wî ji min re got: "Polîs hatiye gotiye careke din wê rojnameyê neynin, em îro wê rojnameyê qedexe dikin." Ez bi bayî re pevçûm, min got: "Hûn ji bo min her roj rojnameke Özgür Gündemê binin, ji polîs re jî bêje, 'jina Yaşar Kaya hat wê derê ji min re got tu rojnameya min bine.'" Paşê ez çûm cem Gurbettelî, min wê rojê Özgür Gündem nexwend, ez derî re ketim hundirê odeya ku Ferda û Gurbettelî lê bûn. Gurbet li cem kalorîferê runiştibû, lê rengê wê spîçolkî bûbû, di çavên wê de çirûsk tunebû, min jê pirs kir: "Gurbet tu nexweş î yan jî serma dikî?" Çavên wê tijî hêstir bûn ji min re got: Birayê min î biçûk ku çenteyê xwe yê doxtoriyê teze dabû destê xwe duh şehîd ket, ez ji keleka wê runiştim, me hev hambêz kir. Em pir bi ber xwe ketibûn, xortên ciwan roj bi roj ji bo welat şehîd diketin. Şerê azadî axa Kurdistanê bi xwîna ciwanan av dibû. Vê sibê jî min rojname da destê xwe, min dît ku Gur-

betellî jî şehîd ketiye, pariyê min mezin bû, ji parî di gewriya min re nedîçûn, ez giriyam ji bo şervana qehreman, min zû da dixwest ez wê bibînim, nebû qismet.. Niha tenê û tenê wêneyên me hene. Wextekê em çûm Enqereyê, min, wê û zilamê min me tev kişandiye. Ez li wî wêneyî mêze dikim, hevaleyê şervan, qehreman û welatparez bû. Bi rastî jî min pir jê hez dikir hevaltîyeke me ya baş hebû bi hev re.

Wextekê ez ji bo mehkemeya zilamê xwe çûm Enqereyê. Di dadgehê de ew jî li cem min rûniştibû, me bi hev re xeber dida, xwar bû di guhe min de got: "Tu zanî ewê li cem te runiştîye polîs e, loma hat li cem me rûnişt, rind lê mêze bike." Bi rastî jî paşê ez ji Enqereyê dizivirîm Stenbolê, ew mirov di otobosê de li pişt min rûniştibû, ez rojekê li pey Gurbettelî çûm Stenbolê, wê şevê min xeber hilda ku polîs çûne rojnameya Özgür Gündemê û ew girtine. Ew roj roja mafên mirovan bû. Ez paşê çûm Girtîgeha Bayrampaşayê, me hevûdu dît, ji min bû, bi rastî jî şaş ma û got: "Tu çawa hatî wê derê? Min ji yê ku li derve disekinin re got ez ebûqat im, paşê nobedarên derve hatin gotin 'ewraqên xwe nîşanî me bide.' Min jî ji wan re got 'zarokê min pir digirîya, loma ez zûtîrekê ji mal derketim, careke din dema ez hatim ezê ewraqên xwe rayî we bidim' û ez hatim."

Min ew li dadgehê jî dît, me hev hambêz kir, leşkerên romê ketin navbera me, min ji leşkeran re got çi heye? Ez ne nexweş im, mîkrop jî di min de tune, hûn çima me ji hev du diqetînin?" Me careke din hev du hambêz. Piştî ku ez ji DGM'ê veqetiyam, ez hatim Özgür Gündemê me li wê derê bi Ferda û hevalên din ve çay vexwer û sohbet kir. Piştî mehekê ew berdan, wê çaxê zilamê min Yaşar jî berdabûn. Ferda jî li wê derê bû em her çar pir şa bûn û bi hev peyivîn çay û qehwe vexwar. Rojên buhurî ji hişê min dernakevin tu caran.. Ji bo wê min guhê xwe da ser evîna dilê xwe yî dilovan û helbestek ji bo Gurbettelî nivîsî.

Kulîlka Zagrosa ya sorgewez

Berf dibare li bilindahiya serê
Zagrosan
Zanim tu nobedar î li serê çiyayên
Başûr îşev...



Ç o -
rek û fanîleyek xwest. Min ji bo wê û hevalên wê fanîleyekî ris çorek birin. Wexta ku wê ez li pêş xwe dîtîm pir şa
Kulîlka şoreşe ya sorgewez
Wextekê hîv diwelidî nuh, li rûyê te
dikeniya li dûrê dûr...
Ji esmanê Başûr stêrk barîn di ser te de,
mîna çilkên baranê
Te herdû destên xwe tev vedikirin
Mîtralyoza xwe dida kêleka xwe ya
rastê

Wexta ku te dengê dijmin bihîst
Li ser her du çokên xwe rûdiniştî
Guhê xwe dida dengê bayê azadiyê
Te zanîbû ku tu ne tenê yî...
Dilê dayikên kurd hemû bi te re ye
Dil û mejiyê min jî bi te re ye
Dixwazim ez bi te re bipeyivim niha di
vê şeva tarî de

mîna salên buhurî.
Sala 1994'an li dadgehê,
Wexta ku cendîrmên romê dixwastin te
ji min biqetînin
Dîsa li kelêka te bim xwişka delal
Qala şerê azadiyê bikam
Ji Aragon rêzên helbestekî biçwînim ji
te re...

Tu zanî ez tu caran te bîr nakim
Ez û tu destê hev bigirin em
Tev derkevin serê çiyayên Zagrosa...
Zanim tu nobedar î li serê çiya îşev
Bila dijmin te tenê nebîne
Yê li te xî şervana qehreman
Berbanga şefeqê li serê çiyayên başûrê
Kurdistanê
Ala xwe ya kesk û sor û zer hilde
Zû welat rizgar bike!



Devrim (Nursel Ülgen)

Li geliyê Guhderna sala 1994'an tevî 7 hevalên xwe li hambêr mêtîngeran rojekê berxwedaneke bi rûmet da. Lê, hêzên dijmin bi gazên kîmyewî ew qetil kirin.

Armanca wan, armanca me ye
Li ser navê DİYAR-TEKSTİL- Kahraman, Bîrsen

Şehîd nemir e wek çiya
Weke berf û weke dar
Wek gulebax û wek bihar

Şehîd av e
tîna zeviyê dişkêne
tilî û dest e
êşa axê dihejîne
Ronahiya çav e
kîjan pêşeroj dâr e
dibîne

Şehîd: Bejna wî/wê
qasî bejna Kurdistan e
dilê azadî û ala herî bilind
a helwesta însan e
(Şerko Bêkes)

□ 27 sermawez 1978: **PKK hate damezirandin.**

Partiya Karkerên Kurdistanê di 27'ê sermawêza 1978'an de hate damezirandin. Ji sala 1976'an û pê ve dest bi xebatên xwe yên siyasî kirin. Di vê demê de bi navê "Apoci" dihatin nasîn. Apociyan digot: "Êdî merhaleya ku em tê de ne têra me nake." Pişt re wan xebatên xwe di riya avakirina partîbûnê de bi pêş ve birin. Di sala 1977'an de bi navê "Riya Şoreşa Kurdistan" manifestoya PKK'ê ji hêla Abdullah Öcalan ve hate nivîsandin. Roja 26-27'ê sermawezê li gundê Fîsê yê Liceya Amedê li mala Seyfettin Zoğurlu, piştî pêkhatina kongreyê PKK ava bû.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 24 sermawez 1975: **Li Çildêranê zelzele çêbû**

Wekî tê zanîn rojhilata bakurê Kurdistanê ji aliyê zêdebûna erdhêjê û zelzeleyan ve de cografayek bi xetere de ye. Bîst û yek sal beriya îro zelzeleyeke bi vî rengî li Çildêrana Wanê qewimî. Di erdhêja ku li gorî pîvana richterê bi tundiya 7.5'an pêk hat de, li gorî daxuyaniyên fermî 3 hezar 840 kes mirin û 9 hezar û 232 avahî ji binî ve hiltweşyan û xisar û ziyarên mezin çêbûn. Ev zelzele li derdora navçeyên Wanê; Bêgir, Erdîş, Ebex û li navçeyên Agiriyê; Gihadîf, Avkevîrê jî tesîra xwe nişan da.

Seyîd Riza û hevalên wî hatin bibîranîn



Di panelê de Suat Parlar da zanîn ku ji salên 1920'an û vir de li Dêrsimê hêzên leşkerî bi cih bûne û got ku yekemîn car ramanê "Yek welat, yek serok û yek partî li Dêrsimê bi cih bûye. Parlar îdia kir ku bingeha kontr-gerîla hê wê gavê li Dêrsimê hatiye avêtin.

Ji bo bîranîna Seyîd Riza û hevalên wî ku 60 salî berî niha hatine darevekirin, li Stenbolê li Med-Komê û li şaxên HADEP'ê bi panel û semîneran hatin lidarxistin.

Panela yekemîn roja 16'ê Sermawezê bi navê "Ji 1937 an ta 1997'an" Dêrsim li Med-Komê hate lidarxistin. Parêzer Suat Parlar, endamê meclîsa HADEP'ê Ahmet Cihan, ji Komeleya Alîkarî û Piştgiyaya Dêrsimê şaxên Stenbol û Îzmîrê Cemal Taş û Hüseyin Ozan wekî panelîst beşdarî panelê bûn. Panela ku bi deqîqeyekê rawestîna li ser piyan ji bo rêzgirtina şehîdên Kurdistanê dest pê kir bi pêşandana DIA'yên Latif Kaya ku wêneyên Dêrsimê berbiçav dikirin, dom kir. Di panelê de Suat Parlar da zanîn ku ji salên 1920'an û vir de li Dêrsimê hêzên leşkerî bi cih bûne û got ku yekemîn car ramanê "Yek welat, yek serok û yek partî li Dêrsimê bi cih bûye. Li hêla din Parlar îdia kir ku bingeha kontr-gerîla hê wê gavê li Dêrsimê hatiye avêtin. Endamê Partiya Meclîsa HADEP'ê Ahmet Cihan di axaftina xwe de bi bir xist ku wekî duh îro jî li Dêrsimê şer ji layê psikolojîk û fizîkî ve didome.

Di heman rojê de li HADEP'a Umraniyeyê, Üsküdar û Bağcılarê jî ji bo girîngiya rojê panel hatin lidarxistin.

Panela li Umraniyeya HADEP'ê saet li 15:00 an dest pê kir. Wekî panelîst Berpirsê

Karê Nivîsaran ê Azadiya Welat M. Salih Taşkesen û xebatkarê Ûlkede Gündemê Hüseyin Karataş beşdar bûn. M. Salih Taşkesen di axaftina xwe de li ser jiyana Seyîd Riza û malbata wî sekinî û behsa nûçeyên ku di çapemeniya tirk û ya derve de ku wê demê li ser Dêrsimê derketibûn, kir. Pişt re hinek dîtin, raman û nivîsên Dr. Nurî Dêrsimî pêşkêş kirin.

Hüseyin Karataş jî, di axaftina xwe de bi giştî li ser Qetlîama Dêrsimê û têkiliyên di navbera Tevgera Şêx Seîd û Seyid Riza de sekinî û analizên balkêş û berbiçav kirin.

Di panela ku bi dorvegerî û ji du beşan pêk hat de M. Salih Taşkesen û Hüseyin Karataş pirsên nivîskî ên beşdarên bersivandin. Panel bi xwendina helbestên bi zaravaya kirdkî û tirkî qediya. Nêzîkî 200 kes beşdarî panelê bûn.


Panela ku li HADEP'a Bağcılarê pêk hat, ji hêla Serokê Komîsyona Ciwanên HADEP'ê Aydın Pervane ve hatibû amadekirin. Bi qasî 150 kesî beşdarî vê panelê bû.

Panelê jî li HADEP'a Uskudarê çêbû 30 kes beşdarî vê panelê bûn. Berpirsê Karê Nivîsaran ê Azadiyê Welat M. Salih Taşkesen û endamê komîsyona ciwanên HADEP'ê wekî panelîst beşdar bûn. Di panelê de bi serhildanê re têkildar li ser şexsiyetên wekî Seyid Riza, Elîşêr, Rayber hate rawestîn.

AZADIYA WELAT/STENBOL

ÇAVDÊRÎ

Înstîtuya Stokholmê kete duyemîn sala xwe



MÎRHEM YIĞIT

Înstîtuya Kurdî li Stokholmê ev du meh in yekemîn sala xwe li xwe bada û kete sala duyemîn. Sala buhurî 9'ê meha rezberê bi şahî û beşdariyê xurt Înstîtû hatibû damezrandin. Di vî temenê kurt de Înstîtûyê mohra xwe li hejmareke xebatên hêja û bi kelk xist û bingeha kitêbxaneyê baş danî. Her wiha hin pirtûk çap kirin û 6 hejmarên kovara Avaşin ku her yek mîna kitêbekê ye weşandin. Ji her aliyê welêt bi gelek nivîskarên navdar, xort û nûhatî re têkilî çêkirin û ji bo xebatên ji niha û pê de zemîneke saxlem anî pê. Înstîtû îro hatiye çêkirin û ji bo berdewambûna jiyana Înstîtûya hatina vî cihî gelekî girîng bû. Berê Înstîtûyê li aliyê hêvîbexş e û ji bo ku Înstîtû bi ser bikeve û gav bi gav riya xwe bibire, giş îmkan û derfet çêbûne. Ji vê awirê ve gava ku ji bîstika hazir li xwe dizivirin û paleyî û firêza salekê heldisengînin em dibînin ku em endamên komîta nû û giş endamên ewil û yên pişt re, em tev pîr-hindik qerzdarên sala buhurî ne.

Sala berê ji bo me bû tecrûbeyek. Niha xebateke ku em pişt xwe bidinê, çêkirin em lê bicivin organeke em tê de binivîsîn û îmkan û teknîkeke di xîzmetê fikir û lêkolînê de û pîr destkeftînin din, hene. Îro giş kurd nebe jî piraniyê berçav ji kurdên li Stokholmê dijîn xebera wan jî Înstîtûya kurdî heye û hejmarê kesên ku ev dezgeha neteweyî ziyaret kirine bi sedan e. Di nav serlêder û kesên ku Înstîtûyê ziyarek dikin de ji her aliyê Kurdistanê û ji her kategoriyê rewşenbîr û xwenda hene.

Înstîtû êdî qonaxa damezrandin û resmîbûyînê li pey xwe dihêle û dibe saziyê xwedî rol, sazkar û neteweyî. Ev rastiyek e ku berî her kesî em endamên Înstîtûyê dibînin, pê netîceyên lazim derxin. Em divê di her alî de hem mîna komîta nû û hem jî mîna endaman em bi erkên xwe rabin û em Înstîtûyê hinekî din bikin navend û organeke organîzekirin û birêxistina kapasîteyên fikrî û nixandina wan.

Di duyemîn sala Înstîtûyê de tiştên tene xwestin û karên gerek bêne kirin xuya ne. Yek ji van karan jî semîner in. Di nameyê komîta Înstîtûyê de mirov dikare van rêzên li jêr bixwîne: "Bi bawerîya me semîner li ser pirs û pirsgerêkên cihê, divê di nav çalakîyên Înstîtûya me de xwediyê çêkirinê serekî bin. Bê semîner, munaqeshe û lêkolînên fikrî û ew jî bi rengê berdewam, em dê tu carî neyên wî cihê ku em dixwazin bêne û di nav hedef û armancên Înstîtûya me de ne. Semîner ne bi tenê ramanên mirovan kûrtir dikin, têkiliyên akademîsyen, rewşenbîr û nivîskarên me di nav xwe de zindûtir û dostanetir dikin, belê her wiha hestê berpirsiyariyê û xebata bi hev re jî han didin ku gelekî hewcedariya me bi wan heye."

Înstîtûyê di vê çarçeweyê de ji bo lidarxistina semîneran komîteyek ava kir. Komîta avabûyî di nav xwe de çend civîn çêkirin û biryar girt ku ji bo sala em tê de û sala li pêşiya me listeyê semîner û semînerdaran amade bike. Semînera ewil roja 15.11.1997'an de li Înstîtûyê hate çêkirin. Di vê semînarê de ji endam û ne endamên Înstîtûyê nivîskar akademîsyenên kurd beşdar bûn û munaqeseyên berdar hatin kirin. Semîner li ser "Teknolojiya ragihandinê û pîrsa kurdan" bû. Semînerdar nivîskar û lêkolînerê kurd Mûrad Ciwan bû. Di vê meh û nîva li pêşiya me de ku ji sala nû re maye, biryar heye ku Înstîtû du semînerên din jî çêbike. Yek ji van li ser "Pirsgerêka kurdan û riya çareseriyê wê" ye. Semînerdarê ewil mamosteyê felsefê û teolojiyê Dr. Hüseyin Xelîqî û yê duyemîn dîroknivîs Dr. Kemal Elî ye. Rojên semîneran jî 6.12.1997 û 20.12.1997 in.

Destanên mîna Cembelî û Zembilîroş di nav xwe de otantîzma kurd û gelek mitosên gelêrî dihewînin. Ger ev destanên me bi şîrovekirineke hemdem û nûjen û objektîf ji nû ve bîrîndin, ez bawer im çawa ku Mezopotamya bûye dayika şaristani û kultura cîhanê de gelên Mezopotamyayê, bi taybetî ji gelê kurd careke din kultura cîhanê bikin bin bandora xwe.

Koma Teatrê ya Şanogerên Gel ên Amedê ku demeke dirêj e, li mawemala Amedê çalakîyên xwe yê şanogeriye diolandin û ta mîha gelek listîkên heja pêşkeşî temayvanan kirine. Hevalê me **ROŞAN ÎEZGÎN** li ser xebat, neşî û mîfînên wan yê hunerê hevpeyvînek bi heppîsê wê komê M. Emin Yalçınkaya re pêk anî.

Pêşî, hinekî koma xwe bi me bide naskirin. Ji kengê ve hûn di nava xebatên teatral de ne?

■ Koma me ji çardeh şanogeran û sê kesên teknîker pêk tê. Hema bibêje tevahiya hevalên me ji Amedê ne. Niha, hevalên ku em bi hev re dixebitin ev demeke gelek dirêj e ku di nav vî karî de ne û giraniya wan jî di teatran taybet de gihîştine. Beriya sala 1990'î li Amedê gelek komên teatrê yê taybet çalakîyên xwe dimeşandin. Di sala 1990'î de Belediyeya Amedê tevahiya van koman, di bin banê xwe de bi navê Teatra Bajar ya Orhan Asena civandin. Paşê, di sala 1991'ê de gava Belediyeya Amedê statûya bajarê mezin stand, vê carê em di bin banê Belediyeya Sûrê ya Amedê de civiyan, lê, piştî xebata salekê li wir jî ji ber hin sedeman xebatên me rawestiyân. Vê carê, me bi derfetên xwe komeke teatrê bi navê "Teatra Anatolê" ava kir. Piştî xebatên salekê vê komê jî, ji ber sedemên aborî xebatên xwe rawestand. Ji ber ku teatrê di ruhê me de bi cih bûbû, me nekarîbû dîrî wê bimînin. Careke din me bi navê "Diyarbakır Halk Oyuncuları (Şanogerhên Gel yê Amedê)" heval gihandin ser hev û me dest bi meşandina xebatên teatral kir.

Hûn ji bo çî bûn şanoger, gelo kêrê di tunebû?

■ Digel ku pîrsa we gelek vekiriye jî, bi rastî wê bersiv klasîk be. Ez bi xwe ji sala 1983'yan û vir de bi misêwayî di nav xebatên teatral de me. Hevalên min yê din jî demeke dirêj e ku di nav vî karî de ne. Dema ku me hîn nû dest bi vî karî kir, em tev amator bûn. Li aliyê din, di kesayetîya mirov de, hinek hestên civakî hene û ev hestên civakî di teatrê de dibin cazîbe û mirov dikişînin nav xwe.

Gelo çî ye teatr? Hûn dixwazî bi

teatrê çî bikin?

■ Niha, teatr bi sedsalan e ku heye, ji şaxên hunerê ya herî kevnare ye. Bi pêşveçûn û guherîna mirovahî û civakî re, ew jî her tim guheriye. Ango, teatr her demê, li gorî rewşa dema xwe bûye. Ez nikarim teatrê di nav gotareke teng de rave bikim. Ev yek jî bo hemû şaxên hunerê derbas dibe. Mesela, Aristofanis li gorî dema xwe teatrê çêkiriye û Muhsin Ertuğrul li gorî rewş û nêrîna dema xwe teatrê çêkiriye, anga di teatrê de her tim guherîneke diyalektîk heye. Mirov dikare bibêje ku, teatr; ji gel re rêberiyê dike, pişt re pêşkeş dike û bi vî awayî gel perwerde dike.

Ji bo çî?

■ Li gorî min gelek sedem hene. Yek jê, heger mirov bi awayekî objektîf li wan teatran ku em di xêta protest de bi nav dikin, binihêrin wê bê dîtin ku, hinek jê di bin siya otoriteyên siyasî de hunerê diafirînin û kar dikin. Ev yek bandorê li hunera wan dike û berhemên wan yekalî ne û zêde ne objektîf in. Gelek hunermendên din jî hene, ji ber tîrsa zordariya sistemê nikarin ji bin zirara ku sistemê desthilatdar daye wan, rabin. Her tim endîşeya jiyana li ser wan e, ev jî wan dike stûxwar.

Baş e, hûn jî ferdek ji gelê kurd in. Ji aliyê hunerî ve hûn rewşa gelê kurd çawa dibînin?

■ Niha, min berê jî got ku her tişt bi hev ve girêdayî ye. Gelê me, ez nizanim ev serê çend sed salan e ku îradeya wî ne di destê wî de bûye. Gelek nîrx û hejahiye wî hatine talankirin, pişavtî û ji gelek aliyan ve hestên wî lawaz bûne. Têkiliya gelê me bi dîroka wî re ji her alî ve hatiye qutkirin. Bi saya pêşveçûnên van salên dawî, guherîna û li xwe vegeherîna gel û civaka me, rastîya gelek tiştan derkete holê.

Ji aliyê din ve, çawa ku dayik û dergûşa şaristaniyê Mezopotamya bûye, ez di vî baweriyê de me ku wê careke



Hunermend M. E.

Di nav jiyana huner de, divê

din gelê kurd bandoreke gelekî mezin li ser çanda cîhanê ya îro bike. Gelê kurd jî aliyê destanên mîtolojîk ve gelek dewlemend e. Va ye, tê dîtin ku ciwanên kurd êdî hay ji vî gencîneyê hene û heger hêdî hêdî be jî, gelek xebatên heja, lêkolîn û lêgerînê çêdibin. Şoreşa çandî ya gelê kurd wê di nêz de biteqe û wê ev yek mîzîna çandê ya cîhanê jî serobino bike.

Ev demeke dirêj e ku hûn li Amedê şanogeriye dikin û we heta niha gelek listîkên teatral pêşkeşî gel kirin. Eleqeya gel li hemberî teatrê çawa ye?

■ Me îsal li Amedê li taxa Îskenderpaşayê sê şevên bêpere û ji gel re vekirî, li dar xistin, ku di nava wan sê şevan de, ji her temenî jî sê hezarî zêdetir mirov li listîkên me temaşê kir. Wekî din me li bajarên kurdan, yê wekî, Batman, Meletî, Mêrdîn û Xerpêtê jî listî-

kên teatrê pêşan dan. Gelê wan deran jî wekî amediyan bi çêşeke mezin û bi girseyî li me temaşê kir. Ev jî bi me didê nîşan ku gelê me çiqas bi hunerê ve girêdayî ye.

Mirov bi saya teatrê dikare civakê çiqas biguherîne?

■ Ev hinek jî di destê bikaranîna huner û mercên civakî de ye. Teatr neynik e. Tiştên ku her roj tîrî serê me û li ber me ne em li wan dinihêrin, lê em nabînin an jî em naxwazî bibînin. Em van tiştan û detayan bi navgîniya teatrê estetîze dikin û derdixînin pêşberî temaşevanên. An jî, em bibêjin belediyeyê park, rê an jî avahiyek çêkiriye ji bo ku gelê jî îstîfade bike, lê bi rastî bikaranîna wan û xwedî lê derketina wan tiştan aîdî gel e. Em bi saya teatrê van tiştan şanî gel didin û gel perwerde dikin.



Ger hunermendek dema bi pirsgirêkên gelê xwe re têkildar nebe û di hunera xwe de wan nahonine, nexebilîne bila dev ji vî karî berde. Hunermend, gereke ta dawiyê bi hunera xwe ve girêdayî be. Cardin, gerek di nav hunera ku tê afirandin û jiyana hunermend û kesayetiya wî de têkiliyê xurt hebe. Huner, divê li gorî rasteqîni û pêwistiyan gel be.

go?

▣ Belê, "Yên Reben" klasîka frensî ya Victor Hugo ye. Tu dizanî, yekem car e ku me ev berhem kiriye teatr. Ta niha du filmên sînemayê li ser çêbûne, lê di cîhanê de ev cara yekem e ku me kiriye listîka şanoyê.

Ji bo çi we Sefiller kiriye şano? Çi têkiliya gelê kurd bi vê klasîka frensî re heye?

▣ Bi rastî jî tiştên ku Hugo wê demê nivîsîne, yanê naveroka Yê reben niha bi heman egeran jî bo gelê kurd derbas dibe. Dibe ku cografya cihê be lê, tiştên niha tîn serê me dişibin mijarên Rebenan. Belkî jî bo me jî hatiye nivîsîn, belkî dirrok xwe dubare dîke.

Wekî din çi projeyên we hene?

▣ Niha Zembilfiroş û Cembelî û Binevşa Narîn li ber destê me ne. Emê wan her du destanên evîni yê gelê kurd bikin listikên teatrê yê muzîkal. Cara pêşîn, di sala 1992'yan de me dest bi xebata li ser Destana Zembilfiroş kir. Di sala 1993'yan de ku NÇM li Amedê vebû (ji xwe ez salekê jî li wir xebitîm),

me Zembilfiroş li wê derê nivîsand û du caran jî li NÇM'ya Amedê me ev listik pêşkêş kir.

Berî ku em dest bi nivîsandina Zembilfiroş bikin, me li ser vê destanê gelek lêkolîn û lêgerîn çêkirin. Em çûn cem dengbêjan û çiqas materyal hebûn, me berhev kirin. Heta xebatek piçûk a Celîlê Celîl jî hebû li ser Zembilfiroş, me ew jî bi dest xist.

Zimanê listîka Zembilfiroş wê bi tirkî be an bi kurdî?

▣ Muzîk bi kurdî, lê belê dialog wê bi tirkî bin. Me li NÇM'ê kurdiya wê jî nivîsbû, lê niha axaftinên wê bi tirkî ne. Piştî ku em "Yên reben" bilîzin îcar emê Zembilfiroş derxin pêşberî temaşevanên xwe. Piştî wê jî Cembelî û Binevşê. Cembelî û Binevş jî gelek rengên wê yê cuda di nava gel de hene. Emê li ser tevan xebatê bikin û di enca-

mê de wê sentezek çêbe. Bi tevayî, bi çavekî hemdemî emê lê binêrin û nêrî-nên, şîroveyên xwe jî tevlê bikin.

Gerek mirov girêdayî otantîzma wan jî bimîne û mîtosa di nav van destanan de xira neke, ne wisa?

▣ Ev destanên eşqê yê bedew û têrwate jixwe bi tevayî malê gelê kurd in û di nav xwe de otantîzma kurd û gelek mîtosên gelêrî dihewînin. Gerek em van êdî derxin qada navneteweyî. Ango çawa ku Romeo-Julîeta Sheakspear li tevayî dinyayê tê nasîn ku dişibe destana Mem û Zîna me. Em dema li mêtûya nivîsandina wan dinîherin Mem û Zîn gelekî beriya Romeo-Julîetê hatiye nivîsîn. Ger ev destanên me bi şîrovekirineke hemdem û nûjen û objektîf jî nû ve bîn afirandin, ez bawer im çawa ku Mezopotamya bûye dayika şaristanî û kultura cîhanê, gelên Mezopotamya-yê, bi taybetî jî gelê kurd wê careke din kultura cîhanê bikin bin bandora xwe.

Hinekî jî em li ser kesayetiya hunermendan bi axivîn, gelo divê kesayetiya hunermend çawa be?

▣

Ger hunermendek bi pirsgirêkên ku gelê xwe re têkildar nebe û di hunera xwe de nehone, nexebilîne bila dev ji vî karî berde, baştir e. Hunermend, gerek e ta dawiyê bi hunerê xwe ve girêdayî be. Gerek di nav hunera ku tê afirandin û jiyana hunermend û kesayetiya wî de hevkeşe û peywendiyê xurt hebe. Huner, divê li gorî rasteqîni û pêwistiyan gel be. Di nav jiyana hunermend û huner de divê nakokî tunebin, heger ne wiha be tilsima hunerê namîne û ew huner bandorê li gel nake.

Em di xebatên we de serkeftin dixwazin û gelek spas dikin ji we re. Ger gotinên we yê dawî hebin, em dikarin guhdarî bikin.

▣ Em jî di sexsiyeta we de jî, ji tevahiya kedkar û xebatkarên rojnameya me ya hêja Azadiya Welat re hurmêt û rêzên xwe pêşkêş dikin û her tim serkeftinê dixwazin. Niha hinek tişt hene ku di dema xwe de zêde qedra wan nayê zanîn, lê demek paşê tê dîtîn ku ev çendî nirxêke bi qîmet û giranbûha ye. Bi rastî Azadiya Welat risteke dîrokî dilîze û qedr û qîmetêke wê ya gelek zêde heye.

min Yalçınkaya:

Hunermend û Nakokî tunebin

Teatr dipirse û dibersivîne jî gelo?

▣ Yek caran alternatîfêk xuya be jî, lê di rastîya xwe de ew bersivê nade. Em temaşevan teşwîkî lêgerîna bersivên pirsan dikin. Şanoger ajîte nake, sloganên navêje. Ev dikeve, warê siyasetmedariyê. Teatr, bi awayekî komedî jî tiştan derdixe holê. Dema temaşevan dide kenandî di heman demê de balê di xîşîna ser hinek xalan. Ger teatr bi qerf û henekên pûç û ele-tewş temaşevan bikenîne, bi rastî ev ne teatr e, ev rasterast qeşmêrî ye. Ku di teatra tirkan de ev gelek heye, mesela wekî Nejat Uygur.

warî gelek balkêş in. Mirovên ji rêzê di nav gel de bi lasayîkirinê mirovên din rexne dikin. Hem kesên derdora xwe dikenîne û hem jî tê de rexneyek xurt heye. Ev bi xwe hunerê e. Ev bi serê xwe mîzaha reş e. Ez bi eslê xwe ji herêma Botan im, tê bîra min li Botan di dawetan de ev tişt gelek çêdibûn. Pîrî caran jî li dawetan listikên teatrê yê tîkîz li dar diketin. Bi rastî jî dema li vî yekê bi hûrbîni bîn vekolîn, wê bê dîtîn ku taybetmendiyên pîrengî û pîralî yê teatral çiqas di nav gelê me de zêde ne.

Niha çi xebat li ber destê we hene?

▣ Em hîna provayên romana "Sefiller (Yên Reben)" dikin. Emê di nava meha Cotmehê de bi vî listikê derkevin pêşberî temaşevanên xwe.

Ev çi reben in. Reben ên Victor Hu-

Gelo mîzaha reş a kurdî heye an na? Hûn di warê hunera xwe de çiqas lêkolînan di nav de gel çêdikin?

▣ Tipolojîyên gelê kurd yê di vî

Taya şer (2)

Sehneya duyemîn

Cih odayek nexweşxaneyê ye. Xal Elî di nav nivînan de ye. Pîreka wî li ber serê wî rûniştîye. Xal Qaso û Mam Zilfî dikevin hundir. Zilfî ji hemû nexweşan re dibêje:

– Geçmiş olsun, Allah şifa vêrsin.

Zilfî: Xal Elî, bi Xwedê tu yê me hemûyan veşêrî...!

Elî: Qaso, te şîr firot? Min ji te re gotibû ji bo min neyê. Ku ez derketim ji min re niv kilo goşt bikire..

Zilfî: Bêyî te hewîniya me nehat.

Qaso: Ka tu baş bibe..

Elî: Ku ez baş nebûm wê Nazê ji te re bimîne!

Qaso: Nazê diya min e.

Nazê: Xwelî li serê te be! Di ber mirinê de ye, dîsa jî dev ji berçûvitiyan ber nade.

Zilfî: Mam Elî, niha li Çiyayê Şerefînê şîre şîra ava sar e, ba di gelî û newalan de dibe sewt, kulîk hev û du maç dikin. Bêrivan ref bi ref dimeşin. Hîre hîra hespan e, kalîna mihan e.. Tu hatibû vî welatî, te çewal bi serê canê xwe ve girê daye..

Elî: Hêstirên xwe paqij dike. Nazê û Qaso jî dest bi girî dikin.

Nazê: Te çewal kişand, wê nivîn gemarî bibin.

Elî: Ez di nivînan de bimîzim.

Hemşîre dikeve hundir. Bi tirkî "Vala bikin", dibêje.

Nazê: Tu li agirê ku bi vî dêlikê ketiye binihêre. Deh roj in ku basa kokteyle ziqûmtal dike.

Hemşîre bi awireke tûj li Nazê dimihêre. Nazê, wekî haya wê jê tune be:

– Sosirmetê kurd e jî. Xwe li kurdî nake xwedî. Ez jî bi kurdî dilê xwe lê rihet dikim.

Qaso: Kurmê darê ji darê ne dayika min...!

Perdeya sêyemîn

Sehneya yekemîn

Li ser perdeyê gotina "Hiş, mejî û dile me hatiye dagir kirin" hatiye nivîsandin. Bi vekirina perdeyê dengê bilûrê bilind dibe.

Di restorantek ewrûpî de sê kesên kurd li ser maseyê, li aliyekî vedixwin, ji hêlekê ve ji derdê xwe vedibêjin!

Newal Kendal Çolî: Ji gelê me re rewşenbîr divê. Hêj wext zû ye!

Serwextbegê Dilwêranbû: Em bêteref in. Riya me zanistî ye...

Ji maseyêke din dengê yekî fransî bilind dibe: "Bonjour, bonjour!"

Çavkanî Hunerhezok: Bes diravên min hebûna, dê min li Kurdistanê cih bikirîya, hemû rewşenbîr û hunerhez bihatana ba hev.

Dengê yekî alman, li dû jî dengê yê fransî bilind dibe:

–Ya, ya ya! Bonjour!

Serwextbegê Dilwêranbû li dû axîneke kûr:

–Rêheval Newal Kendal Çolî ji kerema xwe re ka helbesteke ku bi hêstirên çavan, bi keliya dij û bi hesreta dayikan hatiye hûnandin, guhdarî bike.

Dest bi xwendinê dike:

"Bi şingîna qedexan re dengê sîlehan dibihîzim
Dayê ji me re herb navê
Birano em rewşenbîr in"

li xwe helal dike. Rewşenbîr ronahiya çavên me ne, lê em êdî ji her kaniyê avê venexwin, her dengî nabihîzin.

Sehneya Duyemîn

Çend bankên riziya. Qutiyek sergo. Dayikek tevî lawê xwe li ser bankê rûniştîye. Yek di pêşîya wan re derbas dibe.



Newal Kendal Çolî:

– Belê birayê Serwextbegê Dilwêranbû, ev deh sal in ku ez ji welat dûr ketime, şev û rojan li xwe heram dikim. Pêşnûmayên (taslak) şeş romanên di destê min de hene. Hemû jî ji aliyê karkîl û teşeyê ve modern in. Divê mirov navneteweyî be. Em nikarin propagandaya partiyên bikin...!

Dengê dayikek kurd bilind dibe:

– Rewşenbîr ew e ku ked û şîrê min

Mîraz: Serhat!

Serhat (dizivire): Mîraz! Hevûdu maç dikin. Serhat jî rûdine.

Serhat: Yadê tu çawa yî?

Sarya: Lawê min, ev bajar mirovan dixwe, wînda dike.

Serhad: Her yek bûye Yezdanê kuştinê.

Mîraz: Qey xwedayê vî welatî faş bûye.

Sarya: Yek rojek li welat, hêjayî te-

menekî li vî mîrateyê ye.

Dengê erebeyan, qorneyan, qirîna zarokan tevlihev dibe. Li kolana hember du heb xort maseyê amade dikin. Du kaxiz û du pênûsan datînin ser maseyê. Li pêşîya maseyê ev nivîs heye: "Ji bo qasidên aştiyê înzayek" Yekî çil salî, simbêl zirav û dirêj piştî nivîsê dixwîne diqire:

– Qasidên aştiyê ha! Welat parçe dibê welat! Ji bo welat can fêda be! Dîrok şahidê qehremaniya me ye!

Bi qirîna wî re hejmara mirovan zêdetir dibe. Her ku ew dipeyive kesên ku li derdorê ne, lez dikin ku înzayê biavêjin. Ji nav guraniyê yekî sî salî ber bi yê nijadperest ve diçe, her du destên xwe ên qop ji delingên sako (çekan) dertîne dirêjî çavên wî dike û bi kerb dibêje:

– Ez jî şahid im ez, ka hesabê van destan bide. Wê dîrok careke din bibe şahid...

Bi destê qop radihêje pênûsê, dike nav lêvên xwe, kaxizê înzayê dike. Dengê kesên civiyayî bilind dibe.

– Welat ê bavê çeteyan e.

– Xeta yê me ye, me meydan ji wan re hiştiye.

– Rojê bi dehan cendek tîn.

– Ji biratiyê gelan ditirsin.

– Ev kedxwarên axayên şer in.

Boyaxçiyê ku piştî xwe daye qirangê kolanê lingê xwe yê qop radikişîne. Nanê tisî gez dike, bi hêrs û gazinc:

– Anasîni satim, radyomdan da nefret ediyom. Hiç de bitmîyolar. Demek kî bitmeyen bişey var yahû. Ah eşşek kafama ah! Bîde erkek çocuk diye tütüşüyordum. İyîki olmadı abî, nasıl olsa kızlar gitmez askere... Vatan dezentek-te oluyo abîler...

Li ser banka nêzi Sarya. Jinekek û tevî qîza xwe rûniştîye. Her du jî benîşt dicûn. Tewrên jinikê rê nişan didin. Sê xortên por dirêj, di guhê wan de guhar hene, li derdora wan diçin û tîn.

Bêhna Sarya teng dibe ji **Mîraz** û **Serhat** re:

– Ev mirov, sed carî bîmire ji vî halî ne çêtir e. Niha Dilşa bila em biçûna malika xwe.

Dengê giriya dergûşê tê.

Sarya bi bezê re: Şorecees!

Boyaxçî bi kenekî dûr û drêj:

Bî kiro daha çoxaldî! Ne îkî bîn beşî, bîda devşîrmelerimizden olmazsa...

Dezgehdarek (seyyar satıcı) ji koşê dertê. Dengê teybê bilind dike "Amediyê kêfxweş e..."

Perdê tete girtin li ser perdeyê ev gotin hatiye nivîsandin: "Hûn bi hêsari serî datînin ser balifê."

Li Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 23.11.1997 **Yekşem:** Kanser, Hozan Xanemir Saet:14.00

Konser, Koma Amed Saet :17.30

● 26.11.1997 **Çarşem:** Koray Düzgören "Medya û Siyaset" Saet:17.30

● 28.11.1997 **în:** Şañoja Hêvî "Gurî" Saet:14.00

Konser, Koma Dengê Azadî Saet :17.30

Li BEKSAV 'ê

● 22.11. 1997 **Şemf:** Danasîna Pirtûkan "Dem hertîştê ku jê dibore radimûse" Helbestvan Enver Ercan, Amadekar:Suna Aras Saet:16.00

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



● 23.11.1997 **Yekşem:** Gotûbêj "Bîrdoz û Hîşmendî" Hüsni Aksoy

Saet:16.00

Müştak Erenus û Hunera Wî

Arif Damar, Sennur Sezer, Adnan Özyalçiner, İsmet Kemal Karadayı,

Hüseyin Topçugil, Zihni Anadol, Güngör Ercay, Cengiz Gündoğdu, Seyit

Nezir, Ruşen Hakkı, Yılmaz Elmas, Mustafa Köz, Berrin Taş, Anıl Meriçelli û

İsmet Alıcı wê beşdarî ve bernamêyê bibin.

Amadekar: Suna Aras

Hey hawar... werin bi min ve

Dîsa agir bi dûvê serkaniya giştî ya artêşa tirk ket diqîre û dibêje bigihîjin hawara min. Wekî her carê jî bo ku vî agirî vemirîne, qelemşûrên çapemeniya virker li dora xwe civandin.



Têkçûyina Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirkîyeyê bêhemdî wê be jî, bi gavên ku davêje eşkere dibe. Belê berî niha bi hefteyekê Serkaniya Giştî ya dewletê nehênî kelemşûrên xwe li dor xwe civandin. Ji vê yekê diyar e ku, dîsa agir bi dûvê serkaniyê ve girtiye û venamire. Ew bi vê yekê dixwaze bi qelemşûrên xwe agirê ku ew dorçeperkiriye vemirîne. Her wiha Serkaniya Giştî bi vê mebestê xwe ji rexnekirina hikûmetê jî kêr nahêle û bi vê riyê wan hin hereşeyan (tehdit) arasteyî siyasîyan dike. Jixwe rojnameya Cumhuriyetê jî wekî her carê vî carê jî sernavekî komplowarî jî bo vî birîngê bi kar anîbû "Leşker jî bo şer bang li sivîlan di-kin"

Berî ku em jî bîra bikin ev hewla Serkaniya Giştî jî hêla çapemeniyê ve wekî xebateke mafên mirovan hate hêlîngandin. Tiştêkî din ê balkêş jî vî carê rojnamegerên ku tu carî bange wan nekiribûn, di vî rewîtiyê de cih girtin û gelek rojnamevan bi kincên leşkerî tevî vî operasyona Serkaniya Giştî bûn. Nivîskarê rojnameya İslamî Akîf Abdurahman Dilipak jî yek ji wan bû ku kincê leşkerî li xwe kiribû.

Dîsa Serkaniya Giştî wekî ku her dem dibêje PKK tîk çû an jî tîk diçe. Êdî PKK hew di-kare li ser piyan bimîne, di birîngê de ev yek dubare kir. Lê xuya ye ku daxuyaniyên serkaniya giştî tîr nakokiyên di nav xwe dihevin. Ji daxuyaniyên wê diyar dibe PKK tîk neçûyê roj bi roj mezin dibe. Tevî ku di warê leşkerî de û diplomasiyê ve jî roj bi roj jî berê xurtir û bi hêztir dibe. Ev yek jî nav daxuyaniyên serkaniya giştî, bi awayekî zelal derdikeve holê. Her wiha nivîskarê rojnameya SABAH'ê Necatî

Doğru jî li ser vî yekê di nivîsa xwe de dadixuyîne ku tîrsa artêşê vejîna PKK'ê ye.

Di birîngê de tî gotin ku PKK di sala 1987'an li ber xelabûnê bûyê, piştî rêveberiya awarte (sıkıyönetim) dema OHAL'ê de valahiyeke di warê politikayê de çêdibe, PKK'ê jî ji vî yekê îstifade kiriye. Xala duyemîn jî tî gotin ku, di sala 1990'an de dema şere kendavê koçberên ku berê xwe dane Tirkîyeyê, PKK'ê jî rewşê jî îstifade kiriye. Xala sêyemîn, şerawestandina yek alî ku ji aliyê PKK'ê ve hate îlan-kin, di nav refê dewletê de bê biryarîpêk aniye, vî yekê PKK rizgar kiriye.

Piştî van yekan serkaniya giştî ligel kêmasiyên hikûmetê nakokiyên xwe jî dibêje: "Ev yek jî ber ku pirsgirêkên aborî û civakî di dema xwe de nehatin çareser kirin, îro PKK di warê siyasî de pêş dikeve, divê riyên vî pêşketinê bi awayekî bê berbandkirin. Yanî me di warê leşkeriyê de tiştê ku ji destê me hat kir, ya mayî jî hûn çareser bikin dibêjin."

Di kurdî de jî bo bîkariyê gotineke pêşyan heye em dixwazin wê bibîr bixin. "Emerê çû seferê, lê dîsa hate kerê berê". Belê serkaniya giştî jî mehê careke bi hêviyên zor gewre seferê li dar dixwe. Lê ew hêvî di qiriqa wê de dibê isota Rihayê û bîkariya wê destnîşan dike.

Belê ev heyeta qelemşûran ku jî 28 rojnamevanan pêk dihat, çar rojan li Kurdistanê geriyên. Gera wan bi firokên Skorskî, Skorsikiya ku di dema operasyona Başûr de jî aliyê gerilayan ve bi arîzeyeke teknîkî ku hatibû xistin pêk hat.

AZAD ALTUN

TÎŞK

Nivîsa nivîskarê
me nekete destê
me



BEKIR BAHOZ



M. Ali Yöyler
(24.11.1994) Dêrsim

Çaş û sîxur nezanî
Welat firotin bi erzanî
Mêtinger û nokerî
Welat xistin çar kerî
Ew bûne maşa neyaran
Wan, lak xwarin bi baran
Ew şehîdên pakrewan



Mendan Yöyler
(24.11.1992) Dersim

Lew tî rêtin xwîna wan
Hezar axîn û keser
Xwîn dirêjim ji ceger
ji bona we şehîdan
we leheng û egîdan
Sonda me bi xwîna we
em bernadin riya we

Li ser navê Malbatê Bawer Yöyler

Bangawaziya PEN'a Kurd

Gelî nivîskarên birêz,
Navenda PEN'a KURD
wê kongreyê xwe ya
salane
li dar bixe. Em hemû
nivîskarên kurd, yê ku
bawerîya wî/wê bi
daxuyaniya PEN'a
Navneteweyî
(PEN-Charta) tî,
vedixwînin kongreyê.



Dem: 07.02. 1998

Çih: Haus der ulturen de r Welt, John,Fosfe-Dulles Allee
10, D,10557 Berlîn, Almanya

**LI SER NAVÊ RÊVEBERIYÊ:
DR. ZERDEŞT HACO**

Norşêna mala Azad

Azad berê xwe ber bi deşta Mûşê ve zivirand. Deşta fireh û dirêj, der û dorê wê bi çiya û rêzeçiyên rapêçandî. Deştê jî ji jor ve mîna kevalekê, mîna dîmeneke heyvê xuya dikir. Riya bi qîr ku ji Norşênê ve dihat û ber bi Mûşê ve diçû, mîna xêzêke zirav reş dikir. Gundên deştê; Marîk, Vartinîs, Xivyan, Avzût û bi sedan gundên din ku bi piranî berhem û bermahiyên ermenan in li ser deştê xal bi xal reşandî dixuyan. Zeviyên nû rakirî. Şinahî; gul û giyayê deştê dîmen balkêştir dikir.

Çavên Azad bost bi bost li ser deştê geriya, te digot qey deşt bi çavan dipîviya. Dema berê wî bi aliyê rastê ve zivirî, girê pozê Avzût bi ber çavan ket. Pêta bîrîkirinê û keserê di dilan de hildibû. Çimkî di pişt Girê Avzût de Norşên navçeya Azad bû. Navçeya ku Azad lê hatibû dinyayê û zarokiya xwe tê de derbas kiribû. Azad bi vîna xwe ketibû nava derya xeyalan û tê de avjenî dikir. Zarokatiya ku li ber gola cemidî derbas bûbû. Havînan li ber Çemê Mişkan, Newela Heyder qîrên zarokan ên tax taxî tev de di xiyalên wî de derbas dibû.

Piştî ku şerê çekdarî li herêmê geş bû, qismek mirov zû di mijarê gihîştin, Azad ji yek ji wan bû. Di dibistana navîn de gelek xortan bi listîna gok û bi pêketina keçikan dema xwe derbas dikirin. Lê Azad û çend hevalên wî di deştên wan de cur bi cur pirtûkên şoreşê, di nav bexçe û daristanan de dilebitiyan. Pirtûkên wan ên herî berbiçav pirtûka Che ya bi navê "Ji şervanan re pêşniyazên pratîk" û nemaze pirtûka mamoste Beşikçi "mêtingeha nav dewletan: Kurdistan" bûn. Di mejiyên wan de pîrsên herî asê bi saya vê pirtûka Beşikçi hatibûn bersivandin.

Azad di nav xeyalan de her ku avjenî dikir bîranî û serpêhatiyên wî jî mîna şerîdên filman di serê wî re derbas dibû. Vê gavê jî meşa ku lidarxistibûn hat bîra wî, ji dibistana Norşên mamosteyek sirgûn kiribûn. Azad û xwendekarên dibistanê boykot kiribûn û heya ber qesra qeymeqam meşiyabûn. Qeymeqam bifizar û lavayan ew zivirandibûn dibistanê. Li ser vê bûyerê hezên dewletê çend xwendekar hildabûn binçav. Ew di hewşa Qereqolê de rêz kiribûn û ji wan dipirsyan:

— Kuro Seyfettulah (Azad) kî ji we ye?

Bi banga serleşker re Azad bersiv da: "Seyfettulah ez im." Bejna serleşker ne kêmi du mêtroyan bû. Mîna hirçekî dev bi xwîn û bi çavên dijimini li Azad dinêheriya û got: "Naxêr Seyfettulah ne tu yî!.. Tu bi vê bejn û giraniyê nikarî ev qas tevliheviyê pêk bînî!.."

Azad di dilê xwe de dîkeniya û digot: "Serleşker dibêje pêwîst e, her kes wekî min hirç û keftar be. Lê mixabin em mirov in." Qereqol û serleşker bi taybetî gef li wan xwaribûn û ew berdabûn. Xeyalên Azad mîna xelegên zincî-



rê li di hev rêz dibûn; hîna yek nediqediya yeke din dest pê dikir.

Di salên 1990'î de têkoşînê giraniya xwe danibû navçeyê. Dijmin ji mîna gurên har diavêt ser malên welatparêzan. Mirov kom bi kom digirtin, îşkence dikir û diavêtin zindanan. Gel li hemberî kirinên dewletê yê bi vî rengî aciz dibû û ji bo çalakîyan li hev diqilqiliyan. Tam di wê demê de mebusê Bilîsê Kamran İnan hatibû navçeyê. Li dû wî tirşixur û komek hestîkoj di sûtê de dimeşyan. Girse riya wan biriya got: "Em dixwazin bi Kamran re bipeyivîn." Kamran nedixwest bi gel re têkiliyê deyne, lê disa jî xwe xilas nedikir. Azad ji nav girseyê derket û xwe gihande cem wî. Bi dengê bilind got:

—Kamran!

—Çiye Xorto! Hûn çî dixwazin?

—Dewlet li me zilmê dike, vê gavê komek hevalên me di zindanê de ne. Tu mebusê bajarê me yî, em dixwazin te li cem xwe bibînin.

—Hûn li hemberî dewletê derbikevin wê rewşa we hê dijwartir bibe û ez tiştekî di vî warî de nakim.

Li ser vê bersivê gel bi çepik, bi yûh û bi qîrîn ew protesto dikir. Kamran reverev ji navçeyê diqestiya û diçû. Komek feodalên hestîkoj li ser vê bûyerê qaîl nedibûn. Serokê Belediyeya Norşên digot: "Berpîrsên vê bûyerê xayîn in. Derewan dikin, kesî li gel zilm nekiriye. Heke tiştekî wisa hebe ezê beriya wan derkevim çiyê.."

Azad bi ber xwe de dîkeniya û digot: "Kî xayîn û ne ji dil e, va ye li holê ye. Ez nobedarê çiyayên xwe me û ew jî bürokratekî dijmin e."

Ku ne ji dengê hevalê Özkan, bûya wê gelek pêlên raboriyê bi ser Azad de bihatana.

Özkan: "Hevalê Azad were, heval li ser plana êrişê dixebitin." Bi banga Özkan re Azad hilpekiya. Xem û xeyal, Norşên, Kilxar, xanedanên şexan tev di cih de hiştin û çû. Azad ziviribû jiyana gerîla û pir dilxweş jî bûbû, çimkî di bernamaya livbaziye de Qereqola Kelerê hebû, ew der pir girîng bû.

Wê rojê plan û amadekariyên livbaziye qediyabûn. Evara dîtir êriş li dar ket. Gerîla mîna baz û başokeyan êriş

dibirin ser qereqolê. Deşta Mûşê bi qereqa keleş û mîtralyozên şoreşgeran radibû û rûdinişt. Asîman geh ronî dibû û geh diziviriya tariyê. Pevçûnê demêke dirêj dom kir. Dijmin cerdeke mezin ji kezeba xwe standibû. Lê mixabin gul bê strî û şoreş jî bê şehîd çenedibû.

Heman şev li Çiyayê Kilxar çiyayê li teniştê Norşên, bilind û dirêj ku dijmin li ser radara çekiriye sê çirûsk pêketin. Sê çirûskên biçûk pêketin û venemirîn. Hêdî, hêdî mezin bûn û çiqas çû geştir bûn.

Gel zû bi agir hesiya. Dayîkên ku cegerê xwe bi şoreşê re berda bûn, agir zû dîtin. Dîtin û lev gazî kirin: "Cîran ka binêre ev çî agir e malava!.."

Norşên bûbû temaşekarê dîmena çiyayê Kilxar, mat mabû. Yê derketibûn ser banan, ser dîwaran û şaneşinan tevan temaşê li agir dikirin û diqwestin vê bûyerê şirove bikin. Her yekî tiştê digot û çiqas diçû agir mezin dibû, mîna sê lodên giya hildibû. Yekî digot: "Belk. dijmin hilkiribe!.." Yekî din got: "Naxêr ne dijmin e... Çimkî gerîla beriya çendekê radar hilweşandibû. Kilxar ji dijmin paqij e, tu di vê saetê de dinyayê bidî dijmin ew nikare derkeve ser Çiyayê Kilxar.

Şoreşgerên navçeyê bi mesaja gerîla hesiyabûn û gel jî êdî dizanibû ku sê kom agir, sê şehîd: Özkan, Rênas û Azad bûn.

Bi berbangê re gel li ser riya Mûşê civiyabûn. Girseyek pir mezin berê xwe dan Mûşê û Azad ji nexweşxaneyê hildan û anîn. Norşên li benda rojêke dîroki bû. Sûk û kolan, dezgeh û dîkanên navçeyê girtibûn, gel tev de li hevîya Azad bû. Ji xeynî welatparêzên Norşên, welatparêzên Tetwan, Bidlîs û gundiyan deşta Mûşê tev de mîna lehî herikibûn Norşênê. Eşîrên heremê yê ku heya duh di fîra tîfingê de li hev dîneriyan, deştê biratiyê dabûn hev û bi dilgermî ji bo şehîd Azad civiyabûn ser hev; jin û mêr, xort û keç, kal û zarok bi dirûşmeyan li pey şehîdên xwe dimeşyan. Girse ji bo cara dawî, Azad ber bi mala Azad ve meşiya. Li ber deriyê malê, dê û bavê Azad bi awayekî serbilind şehîdê xwe pêşwazî kirin. Dayika Azad, dayika şoreşê ala kesê û sor û zer di destan de anî û raxiste ser darbesta Azad û diqiriya: "Ez dayika şehîdan im... Ez serbilind im."

Azad bi ala pîroz hildan ser milan bi dirûşme, bi şîr bi çepikan berê xwe dan goristanê. Dijminê dagirker hewl da xwe ku li ber vê meşê bigire, lê pîrbûna girseyê ew tirsand ji bégavî tîkil nebû. Wekî her caran şêx û feodalên hestîkoj xwestin ji vê bûyerê ji xwe re sûtê wergirin, lê belê gel êdî ew ji wekî berê ji xwe mezin nedihesiband. Piştê vê bûyerê tiştê din jî baş diyar dibû ku êdî Norşên ne Norşêna mala Şêx e. Norşên êdî Norşêna mala Azad, Norşêna şehîd û şoreşgerên Kurdistanê ye.

AYETULLAH ARSLANARGUN

Jiyana Rewşen

Kovara Jiyana Rewşen piştî hejmara xwe ya taybet ku ji nivîsarên girîgehê pêk hatibû, bi hejmara xwe ya sêzdemîn derket pêşberî xwendevanên xwe.

Wekî ku berpîrsên kovarê jî di hejmarên xwe yê berê de ragihandibûn ku, wê di hejmara xwe yê nû de hinek guhertinan pêk binin, hin guhartin di vê hejmara kovarê de hene, mînak; rûpelên kovarê jî 72 rûpelan derxistine 80 rûpelan, di berg û rûpelan de hinek guhartin hene û ferhengokek çend guhartinên berbiçav in.

Ji aliyê naverokê ve jî wekî kurteçîrok, çîrokên gelêrî, dîrok, pexşan, fabl, helbest, nîrxandin, nasandina şexsiyetên girîng, zargotîn û hevpeyvîn û hwd.

Bi kurteçîrokên xwe Helîm Yûsiv, Cemil Denli, Kamiran Haco, Pîr Rûstem û Umur Hozath jî bi zaravaya dimilkî di vê hejmarê de cih digirin. Kawar Nemir bi ceribandineke xwe ya bi navê "Şimikên Apê Oblomov" û bi nîrxandina navê "Saziyek dewletek e" bi du nivîsên xwe di kovarê de cih digire. Abbas Îsmail di nivîsara xwe de li ser Dewleta Mervanî radiweste û nîrxandinan dike. Seroka Giştîya NÇM'ê Nuray Şen jî bi pexşaneke li ser girîngî û mîsyona NÇM radiweste.

Feqî Hüseyin Sağınç di vê hejmarê de li ser jiyana Mîr Kamiran Alî Bedîrxan û cihê wî yê di wêjeya kurdî de radiweste. Nivîskar bi nasandina Kamiran Alî Be-

dirxan re li ser malbata Bedîrxaniyan û têkoşîna wan a li dijî Osmaniyan jî agahiyan dide. Jan Dost jî di nivîsa xwe de li ser jiyana Ehmedê Xanî sekiniye û mijarên wekî gelperwerî û yekîtiyê bi çend mînakên di helbestên wî de destnîşan dike. Wekî din Yakup Başboğa li ser jiyana û şex iyeteta fîzîknasê navdar Albert Einstein nivîsandiyê.

Di nivîseke ku ji aliyê Abbas Alkan ve bi navê "Çand, huner û folklor" de hatiye nivîsandin de astengiyan ku li hemberî pêşveçûna çanda kurdan in şîrove dike û girîngiya zargotînê di çanda gelan de tîne zimên. Dewlemendbûna zargotîna kurdî bi çend stranên li ser bûkan, govendê, xeribiyê, evîndariyê, pesindariyê, afatiyê û hwd. eşkere dike. Adar Jiyana bi ristekê (fabl) "Şêrê pîr, kerê boz û roviyê fenok" di nava rûpelên kovarê de cihê xwe girtiye.

Bi helbestên xwe; Evdila Pêşew, A. Rahman Çelik, Ferhat Îçmo, İbrahim S. Aydoğan, Bêwar İbrahim, Mihemed N. Xorşîd, Rifat Duman, Cihan Roj di vê hejmarê de ba-

lê dikişînin. Ji bilî van tiştan çîrokek gelêrî bi navê "Mîrze Mihemed", hevpeyvînek digel "Şanoya Hêvî" mijarên kovarê ne. Wekî li gorî naverokê diyar dibe ku ev hejmara Jiyana Rewşen bi mijarên cur bi cur dagirtî ye û li gorî hejmarên berê bêhtir serkeftî ye.

SERWISA ÇANDÊ



Nûbihar

Hejmara 56'an a kovara çand û hunerî Nûbihar derket. Di vê hejmarê kovarê de li ser mijarên celeb bi celeb nivîs hene. Giraniya nivîsên ku derketine çand hunerî ne, lê hinek nivîsên siyasî jî balê dikişînin. Bi taybetî di sergotara vê hejmarê de xwedî û berpîrsê karê nivîsaran ê kovarê Süleyman Çevik li ser taybetiyeke civaka tirk ra-



westiyaye. Di vê nivîsa bi navê "Peydakirina dijminên xeyalî" de Çevik dide zanîn ku rayedarên tirk çî kes gotineke ne bi dilê wan bike, wî/wê wekî dijminê neteweya tirk bi nav dîkin. Süleyman Çevik piştî ku bal

kişandiyê ser nebaşbûna tîkiliyên dewleta tirk bi cîranê wê re, wekî sedema vê yekê jî nîjadperestiyê destnîşan dike.

Berpîrsê Giştî yê Nûbiharê Sabah Kara wergerandina beytên Baba Tahîrê Uryan ji zaravayê lorî di vê hejmarê de jî didomîne. Kesên ku di vê hejmarê Nûbiharê de bi gotar, kurteçîrok, helbest û wergerên xwe balê dikişînin ev in: Ali Karadeniz, Sîdîq Gorîvan, Müfid Yüksel, R. Karakaya, Berhîm Paşa, Hesên Zinar, Abbas Alkan, Kerem Soylu, Bavê Xecê, Koyo Berz.

Wêjenasiya Melayê Cizîrî

CELALETTİN YÖYLER



Di nav wêjezanên cîhanê û ên kurd de mezinahiya wêjezaniya Melayê Cizîrî diyar e. Bedewî û dewlemendî ya hunera wêjeya kevnare ya kurdî, di beytên dîwana Melayê Cizîrî de diçilwilin. Lewre çî dem û gava ku mirov xwe berdide nava deryaya hunera wêjeya dîwana Melayê Cizîrî, mirov li hezaran neqş û nemûşên cur bi cur ên hunerên wêjeyî di nava wê deryayê de rast tê û dibîne. Mîna ku mirov di nava wê deryaya mezin de, rastî bi hezaran, yaqût û mircanên pir bihabilind û bêhempa were. Lewre di nav peyv û rêzên beytên Mela de, mirov rastî bi sedan mijarên zanistî û wêjeyî tê. Wekî rast hatina zanistî ya îstîfarî, kinayî, mecazî, astronomî, gerdûnî, yekbûyîna heyînan (wehtetulwucûd), û bedewiya peyvên hunera wêjeyî û zanistiya nexşeya pîrên deverê, bax û baxçe, qesr û qonaxên, di welatê me Mezopotamyayê de.

Ez dixwazim ji wê deryaya tijî hal û dîr çend mînan derxime meydanê û binirxînim. Dema seydayê mezin û hêja Mele Ehmedê Cizîrî di beytên xwe de dibêje: "Şîkur bînahiya min hat û Yeqûb dîde rewşan bû, bi boya Yusifê Misrê li kenanê ber ser peyda." Di vê beytê de wêjezanê mezin Seyda Mela Ehmed, hem kinayete, hem jî meşabehetê bi hev re bi kar tîne û zargotîna wêjeyê pê dixemlîne. Wekî çawa ku di şûna dilberê de bi zargotîneke kinayî bînahî dixebitîne û dibêje: "Şîkur bînahiya min hat" yanî dilbera min hat. Hem jî wekî anîna bînahiyê, di şûna dilberê de, çawa kinayete, wisa jî teşbih e, yanî Mela ji ber pir hezkirin û rûmetdayîna ji dilberê re dibêje: "Bînahiya min hat" yanî ew dilbera ku hezkirina wî, li cem Mela wekî ronahiya çavê wî ye û dibêje: "Şîkur bînahiya min hat, dîsa di eynî rêzê de li pey tîne dibêje: "Ye qûb dîde rewşan bû, yanî Ye qûb pêximber çavên wî ronahî bûn, bi çî? Bi boya Yusifê Misrê, yanî bi bînkirina kirasê Yusufê ku li bajarê Misrê rûdine, di van çend peyvên dawî de, Mela teşbihê belîx dixebitîne, yanî dibêje: Ez bi nedîtîna dilberê wekî Ye qûbê bavê Yusuf kor bûm, dema ku min dilberê dît ez wekî Ye qûb pêximber dema ku bi bînkirina kirasê Yusuf her du çavê wî vebûn û bûne xwedanê dîtin

û ronahiyê, bi dîtîna dilberê ez bûme xwedanê dîtîna û ronahiyê, hem jî çawa teşbihê belîx dixebitîne, wisa jî mecazeyê dixebitîne, yanî xwe ango kesekî çav sax wekî Ye qûb pêximberê çav ne sax dihejmêre û dibêje: "Ku Ye qûb dîde rewşan bû yanî çawa çavê Ye qûb xudan ronahî bû yê mîrî jî wisa bi dîtîna dilberê ronahî bûn. Çira mecaz e? Lewra teşbihê kesê sax bi kesê kor di vebûna çavan de

Pir mixabin ji ber perîşanî û nexwendî mayîna gelê kurd, bi sedan berhemên mela û seydayên ên wekî Ehmedê Cizîrî ji lêkolînên zanistî, wêjeyî û dîrokî bêpar mane. Bi rastî edebiyata Melayê Cizîrî, di qada navneteweyî û nemaze di Rojhilata Navîn de, di radeya wêjezanên herî bilind de ye. Ji ber vê girîngiyê min rahişte pênûsê ku ez bi zaravayê kurmançî dîwana Mela, peyv bi peyv bi wate û şîrove bikim. Dîwana mela her çiqas bi diyalekta kurmançî jî hatiye nivîsandin dîsa jî pêwîstiyêke pir girîng bi şîrovekirina vê dîwana hêja heye. Lewre hem di nava diyalekta wî ya bi kurmançî de, hem jî ji bilî diyalekta kurmançî, di nava nivîsên beytên Mela de, bi sedan peyvên erebî, farisî, tirkî û yê kurdî, ku her xwendevanê kurd bi hêsanî nikare bixwîne, hene.


Bi qasî nokan selewat

Yekî ku di jiyana xwe de pir tiştên ji derî adedan kiribûn. Wekî dizî, qumar, zîna, kuştin giş kiribûn. Rojekê hevalekî wî jê re dibêje: "Kuro bes e, ev karê te, weleh tuyê li wê dinyayê ezabê vî karê xwe pir bikişînî. Ka were ez te bibime ba şêx ji xwe re tobe bike."

Ji ber hevalê xwe nake der, dibêje: "De were em herin ba şêx." Hevalê wî, wî dibe ba şêx. Şêx jê re dibêje:

–Binêhire, ji bo ku gunehên te efû bibin, tuyê ji niha û pê ve îbadetekê bikî û tuyê rojê hezar selwatî bikişînî. Serê sibehê sêsedî, nîvro çarsedî û êvarî jî sêsed selwatî bikişînî. Încax wiha wê Xwedê te efû bike.

Dibêje: "Bila" û vedigere mala xwe. Wekî şêx jê re gotiye, sibehê sêsed, nîvro çarsed û êvarî disa sêsed selwatî dikişîne. Lê belê du roj sê roj derbas dibe, aciz dibe. Êdî nikare hezar selwatî bikişîne. Ji xwe re difikire û dibêje: "Divê ez ji vî karî re sivika hiyêkê



çêbikim." Radibe kundirêkî tîne û hezar nokî dixê hundirê kundir û rojê çarekê tenê kundir kil dîke û dibêje:

–Bi qasî nokên di kundir de selewat, bi qasî nokên di kundir de selewaaat...!

ÇIYA MAZÎ

Ş-e-y-t-a-n

Pîra yêzîd ji kurê xwe re gotibû:

–Kurê min, tu carî navê wî nebêje haa! Tu carî tu nebêjîtan. Heke tu bibêjî wê çavên te kor bibin.

Kurê wê jê ditirsiya û bi wê tirsê rojekê dikeve nava nivînan û li hêfê diavêje ser serê xwe. Ev gotîna diya wî jê re dibe derd û kul. Biryar dide ku vî navê bi lêv bike. Bi tirs û hêdî hêdî tîpan rêz dike:

Pêşî got: 'Ş' dû re 'E' dû re 'Y' û dû re 'T', 'A', 'N'. Giş qediyana û got: "Şeytaaan" û li hêf ji ser xwe avêt û got:

Yadê, yadêêê, weleh te ez xapandim, weleh te ez xapandim, tiştêk bi min nehat, çavên min jî kor nebûne!

Sardir Sermadir

Biro diçû dibistana seretayî. Wekî her kurdi wî jî bi tirkî nizanibû. Rojekê dereng dihere dibistanê.

Mamosteyê wî jê re dibêje:

–Tu çima dereng hatiye dibistanê? Biro bersiva mamoste dide:

–Sardir, sermadir, şorba sibê germdir û heta henikê danî ben xwardir û ben geldî Erdalko zîl çaldî

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (95)

XAÇEPIRSA

G	D	T	S	A
H	A	R	A	N
T	E	R	I	K
J	A	N	R	O
N	D	T	I	R
E	D	I	R	N
I	N	A	L	A
A	N	V	A	Ş

Bersiva Xaçepirsa 93'yan

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çi bersiv bigihîjin me, emê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesên belav bikin. Xelata hejmara me ya 95'an Pirtûka Berhîm Paşa (GAZIYA MIN) e




Jêrenot: Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata xaçepirsa hejmara 93'yan kasetê Koma Rojhilat "MEZRBOTAN IM EZ" qezenc kirine: Fuat Alpergün/Izmir, Musa Boztas/Mersin, Elişer Avcı/Amed, Salih Aktas/Riha, Metin Demir/Mêrdin

Keysfile	Emeg	Ev sal	Gram Dîrsek	Hotela berê	Zexel
Şehîdek (wêne)	Peyva bûn			Bi tirkî xas	
Bîrewerî		Qertafek		Paşgîrek	
Xezal		Aza		Lîng	
		Şeklek Hidrojen			Cinavkek
Pan			Kêfxweş		Nexweşiye k
Çem			Navêki mîran		Derd, kul
		Dayik		Paşî, encam	
Amûrek				Bi devokî nav	
		Fîna			
		Beyreq			
Gelekî jî Behra Spi	Tipa yekemîn		Awayê tewandî yê dew Tîpeke kurdi		



PEYVA VEŞARÎ



Medyaya tirk bi cilên leşkeran pirsgirêka kurd çareser dikin!



Navenda Çanda Mezopotomya ra koma newî:

Vengê Sodirî

Zek yeno zanayin lehçeya dimilî de hetanî nika vêşî teva nêvirazyawo. La belê, di hîrî seriyê newe newe lehçeya dimilî de mexelê (berhem) neweyê vejyênê werte. Coka lehçeya dimilî de tevawo newe ke beno, şaro ci rê wayir vejyeno.

Navenda Çanda mezopotamya wa, xeftiyayanê xo roj ra roj kena vêşî. Û awa her roj mexelê (ürün) newey pêşkeşê şardê ma kena. Yanê racenayinê, binçim qirotenê, zere çekerdinê û vardayinê dewleta tirkê perey nêkenê û iyê nêşenê verê xeftiyayanê NÇM bigrê.

Zek yeno zanayin, nê rojanê peyinan de vardayinê dewleta tirk NÇM sero bi vêşî. Taybetî ji şaxê Riha û Mêrsinî sero. Dewleta tirk 2 heftey verî şaxê NÇM ya Riha racena, Serokê NÇM'ya Mêrsin Servet Özkan û endamê Teatra Jiyana Nû Kemal Ulusoy çekerê girotxane.

Navenda Çanda Mezopotamya nê vardayan, zere çekerdan û racenayan miyan de nêmeyê Koma Vengê Sodirî de jû koma newî vet werte. Koma Vengê Sodirî mexelê xo yo siftayin, 16'ê meng de şaxê NÇM ya Stenbolî de jew konsera pêşkeşê şarî kerd.

Koma Vengê Sodirî hetê 6 xortana niyawa ro û awa nezdiyê jû sero xeftiyayanê xo lehçeya dimilî (kirdkî) ya şaxê NÇM ya Stenbol de ramena. Endamê Koma Vengê Sodirî ra Hidir û Ayfer Sêwaz rayê, Huseyin û Hesên Gimjim rayê, Nurcan Amed û Şengul jî Dêrsim rawa. Nînan ra Hidir Tembûre cenano, Huseyin Gîtar ceneno, Ayfer û Hesên vatox ê, Nurcan hem vatox a, hem neqra cenana, Şengul jî, hem vatox a û hem jî flût cenana.

Koma Vengê Sodirî konserê xo yê siftayin de 19 deyrî (klamî) vatî, 2 hebê nînan kurmancî bî, ê binî pêro dimilî bî. Hirê deyrê dimilî hetê kome ra virazyayê, jû hetê endamê Agirê Jiyân Nailî ya virazyawa û ê bî-



nî jî arêkerdeyî (derleme). Deyrê ke konser de vajyay, giranî deyrê çöşmeyê Dêrsim û Gimjim bî.

Zek yeno zanayin lehçeya dimilî de hetanî nika vêşî teva nêvirazyawo. La belê, di hîrî seriyê newe newe lehçeya dimilî de mexelê neweyê vejyênê werte. Coka lehçeya dimilî de tevawo newe ke beno, şaro ci rê wayir vejyeno. Rastî mi bi xo konserê Koma Vengê Sodirî de jî, eno dî. Şar Koma Vengê Sodirî rê wayir vejya.

Wayir vejyayin ra bike êkê peyheshaybî konserê Vengê Sodirî esto 16'ê meng de ameybî şaxê NÇM ya Stenbolî û nezdiyê 300 mardiman eywanê (salona) NÇM kerdî bî pir. Rastî heveyê kemiyinê Koma Vengê Sodirî estîbî, ê jî hetê peyê konseriya kerdî taynî. Çimke konserê ci no newe bi coka sifto nêşa wastenane xo û temaşekeran biyaro cadê ci, la belê hetê peyê konseriya kemiyinî kerdî taynî û hem jî şar kerd kêf-weş.

MEMED DREWŞ/ STENBOL

WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

Berpîrsê têkiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
METİN AKSOY

Berpîrsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.
BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:
(Nünerê Giştî yê
Ewropayê)
Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:
Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsis
Berlin:
Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:
Selim Biççik
49 572 18 13 60

Stockholm:
Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

PKK, Fîs û Manifesto

Êdî bi tenê ji bo partîbûnê, lidarxistina kongreyê mabû. Ew jî di 26-27'ê sermaweza 1978'an de li gundê Fîs ê ku girêdahiye Lice ya Amedê ye bi navê "Kongreya Damezirandina PKK'ê" li mala Seyfettin. Zoğurlu pêk hat.



Di destpêka salên 1970'yî de tevgera ciwan û xwendekarên şoreşger li Tirkîyeyê di xurtirin dema de xwe ye. Abdullah Öcalan li Enqereyê li Fakulteya Zanistên Siyasî xwendekar e. Eleqedarîyeke germ nîşanî tevgera têkoşîna şoreşger a tirk dide. Pratîka Mahir Çayan û Deniz Gezmiş ji nêz ve dişopîne. Bûyera Kızılderewê û Cuntaya 12'ê Adarê pêşveçûneke xurt di hestên neteweyî yên Öcalan de pêk tîne. Öcalan ji bo protestokirina bûyera Kızılderewê rêberîya boykotekê dike. Ji ber vê yekê tê girtin û 6 mehan di girtîgehê de dimîne.

Öcalan, piştî ku ji girtîgehê derdikeve, li ser neteweperestîya kevnare û tevgerên şoreşger ên Tirkîyeyê û cihanê tehlîlan dike û bi giranî jî li ser pirsgerêka neteweyî ya kurd radiweste. Di tespît û analizên wî de xalên wekî serxwebûn, rêxistibûn, şeweyên têkoşînê hebûn. Li gorî Öcalan çareserîya pirsên wiha girêdayî bi enîbûn û partîbûnê bû. Di destpêkê de bi sêmpatîzanên THKP/C yê re hereket kir. Demekê jî serokatî û rêberîya ciwanên ve rêxistinê kir. Di heman demê de Öcalan, di nav komeleya xortan a bi navê ADYÖD 'ê de jî xebitî. Di destpêkê de ev rêxistin di bin însiyatîfa hêzên reformîst de bû, pişt re ev komele kete bin kontrola THKP/C û navê wê wekî AYÖD hate guhartin. Di dawiyê de jî AYÖD bû rêxistina ciwanên DEV-YOL'ê. Kemal Pir û Haki Karer di nav vê komeleyê de kar dikirin.

Apocîtiyê li mala Kemal pîr dest pê kir

Kemal Pîr û Haki Karer yekemîn rêhevalên Öcalan in. Kemal Pîr hevnanîna xwe û Öcalan di axaftineke xwe de wiha tîne zimên: "Ji bo ku lê bimîne li xaniyekî digeriya, hevlekî min mala min a ku Haki Karer jî lê dima, jê re pêş-

niyaz dike. Rojekê hate mala me û wiha got: 'Mala ku ez lê bimînim tuneye, lê min bihîstîye ku li vê derê cih heye, ji îro û şûn de emê bi hev re bimînin...' Bêyî ku li hêviya bersiva bimîne, hat û di mal de bi cih bû. Piştî hevnanîya me bi çend rojan li malê otorîte derbasî wî bû. Êdî em wekî wî difikirin û dixebitîn. Hêj li holê politikayek, komek û rêxistinêke cidî tunebû, lê ew ji bo me êdî bûbû serokê komê yê xwezahî. Apocîtiyê bi vî rengî dest pê kir."

Cemil Bayık rêhevalê sêyemîn ê



Öcalan bû. Pişt re bi rêzê ji SBF'yê Afî Haydar Kaytan, ji Fakulteya Fenê Duran Kalkan, Mazlum Doğan, Hayri Durmuş di nav vê komê de cihê xwe digirin. Koma Apocîyan rexneyên tîj li çepgirên tirk û neteweperestîya klasîk a kurd barandin. Kemalîzm jî binî ve red kirin, tevgera Barzaniyan nepejirandin. Reformîstên kurd wekî "xulam-cehş", çepa tirk jî wekî "Şovenîstên Sosyal" bi nav kirin. Ne bi tenê nêzîktêdayin her wiha şeweya xebata Apocîyan jî cihêreng bû. Lewre jî ew bûn hedefa rexne û êrişên

tund yên çepgirên tirk û kurd.

Taybetmendîyeke Apocîyan jî ew bû ku; tevahiya wan ji malbatên belengaz dihatin. Wekî din tevahiya wan xwendekarên zanîngehan bûn. Tiştê balkêş ew bû ku yek ji wan jî mezûn nebû.

Piştî ku Apocî ji merhaleya kombûnê derbas bûn, dest bi lêkolînên îdeolojîk kirin. Di serî de li Enqereyê li "Pirtûkxaneyê Mîlî" û li tevahiya pirtûkxaneyan dest bi lêkolînan kirin. Ji van lêkolînan tespîtên wiha derketibûn: "Kurdistan mêtîngeh e, li Kurdistanê pirsgerêka şexsiyê heye, mafê gelê kurd heye ku çarenûsa xwe bi destê xwe diyar bike, rêxistineke ku ji şoreşgerên profesyonel pêk tê pêwîst e..." Piştî lêkolînên îdeolojîk ên bi vî rengî, ji sala 1974'an şûn de, xwendekarên zanîngehan li dor Apocîyan civiyan.

Di sala 1976'an Apocîyan biryar girtin ku biçin Kurdistanê. Di destpêkê de kadro çûn bajarên wekî Xerpêt, Dêrsim, Dilûk, Riha, Batman û hwd. Ji bo vê xebatê Cemil Bayık û Kemal Pîr hatin Dilûkê cihê xebata Haki Karer jî Edene bû, lê piştî demeke kurt ew jî derbasî Dilûkê bû. Di vê navberê de Öcalan li tevahiya Kurdistanê gav bi gav digeriya. Piştî vê xebatê Apocîti di nav xortên Kurdistanê de di demeke kurt de belav bû.

niyan ve ku girêdana wan bi dewletê re xurt e, hate qetandin. Wê demê Silêmaniyan digotin "Emê Hilwanê ji Apocîyan re bikin goristan". Li hemberî helwesta Silêmaniyan Apocî li Hilwanê li hev civiyan, lê civîn jî hêla ve eşîrê ve hate gulebarankirin. Di êrişê de Halil Çavgun şehîd ket. Piştî vê bûyerê Apocîyan li dijî Sileymaniyan şer îlan kir, di şerê 5 mehan de ji Silêmaniyan gelek kes hatin kuştin. Di encama van êrişan de Silêmaniyan di hoparlörên belediye-yê teslîmbûna xwe ragihandin, ji belediye-yê îstîfa kirin û çekên xwe teslîm Apocîyan kirin. Piştî tasfiyebûna Silêmaniyan, li herêmên wekî Semsûr, Siwêrek, Serekaniyê, Batman, û Dilûkê Apocî hin bêhtir bûn xwedî hêz, êdî li van herêman piraniya sendika û belediye ketin bin destê wan.

Piştî Silêmaniyan rêxistina "Têkoşîn" derket hemberî Apocîyan û êriş birin ser wan. Apocîyan berê xwe dane vê rêxistinê û di demeke kurt de ew jî tasfiye kirin.

Apocî dibin PKK'yî

Li gorî Apocîyan bêyî damezirandina partiyeke şoreşger, aloziyên li holê çareser nedibûn. Lewre jî rêxistinbûneke bi vî rengî pêwîst hate dîtin. Xebatên destpêkê di sala 1977'an de ji hêla Öcalan ve hatin kirin. Dîsa jî hêla Öcalan ve "Riya Şoreşa Kurdistanê" ku wekî Manifesto tê binavkirin, hate nivîsandin.

Êdî bi tenê ji bo partîbûnê, lidarxistina kongreyê mabû. Ew jî di 26-27'ê sermaweza 1978'an de li gundê Fîsê ku girêdahiye Liceya Amedê ye, bi navê "Kongreya avabûna PKK'ê" li mala Seyfettin Zoğurlu (pişt re di nav refên gerîla de şehîd ket) pêk hat.

PKK'ê piştî ku li Hilwanê Silêmaniyan tîk birin, li Siwêrekê berê xwe da Bucakan. Parlamenterê AP ku serokê eşîra Bucakan Celal Bucak neyarê koka PKK'ê bû. PKK biryar girt ku Celal Bucak bikuje. PKK êriş bir ser gundê Bucakan Kirbaşiyê. Di êrişê de gelek kes hatin kuştin, lê Celal Bucak bi awayekî birîndar ji destê PKK'ê filitî. Li gorî plana PKK'ê wê Celal Bucak li navenda Siwêreke bihata înfazkirin. Di vê demê de PKK "Konseya Leşkerî" damezirand û Mehmet Karasungur bû berpîrsê ve koneyê. Dewletê giraniya hêza xwe şand ser PKK'ê. Lê bi tevî alikariya dewletê eşîra Bucakan her çiqas li hemberî PKK'ê di warê leşkerî de li ser lîngan mabû jî, lê di warê siyasî de li hemberî PKK'ê tîk çû.

AMADEKAR: SALIHÊ KEVIRBIRÎ Çavkanî: (Özgür Ülke. hej: 214-215-216)

Şehadeta Haki Karer

Bihêzbûna Apocîyan ne bi tenê ji bo dewletê, her wiha ji bo hêzên kurd ên paşvêrî jî bûbû xewnerêşk (kabus). Wekî mînak Haki Karer di 18'ê gulana 1977'an de ji hêla Alaatin Kaplan ku endamê Stêrka Sor bû ve hate kuştin. Sala 1978 ji bo Apocîyan sala otorîtebûna li Kurdistanê ye. Di 18'ê gulana 1978'an de di salvegera şehadeta Haki Karer de, afîşên Haki Karer ji hêla Apocîyan ve li Hilwanê bi dîwaran ve hatin zeliqandin. Ev afîş jî hêla eşîra Sileyma-